helbest



ŞÊRKO BÊKES

Xom.. Ew wextey ballindem!

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

Xom.. Ew wextey ballindem!

Xom.. Ew wextey ballindem!

ŞÊRKO BÊKES

NEFEL
Stockholm
2004

www.nefel.com
info@nefel.com

Şêrko Bêkes: Xom.. Ew wextey ballindem!

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Şêrko Bêkes û Nefel

Çapa dîjîtal: 2004
ISBN: 91-89687-18-3

Edîtor: Arif Zêrevan
Serastkirina latîniya kitêbê: Newzad Hirorî

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Ev kitêb bi hevkariya Nefelê û Serdemê
hatiye amade kirin û weşandin.

Çapa yekê: 2002 – Silêmanî

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

nêwerok

Beşî yekem: Kejî şî'r 11

Le rarrewe nisirmekanî leş da 13
Daykim.. Lewê, le pişt oqyanûsekanewe! 17
Çaw le rêy rojhellat 21
Dûrîyanekan 24
Bo yanze tabloy hunermend Namîq Elî Qadir 27
Mehall 30
Pia 33
Le şemmeyek da 40
Mihêdîn Zengene 47
Kemal Mezher 48

Beşî dûwem: Ballinde biçkolekan 51

Le naw sebetekey da... 53
Xom.. ew wextey ballindem! 54
Taşeberdê 55
Dawa 56
Baweş 57
Hellkendin 58
Gêlas 59
Ahengêk 60
Bazney 'eşiq 61
Diwa dîdar 62
Tawan 63
Taqe reng 64
Dinya 65
Qij 66

Çîrokî gurgê 67
Awêne û payîz 68
Leyekneçûn! 69
Wênekêş 70
Newres 71
Kiç 72
Bîrneçûnewe 73
Heştem roj 75
Behane! 76
Hemîşe 'eşiq! 78
Namey rûbarê 79
Dû razî romansiyane 81
Hawser! 83
Eşqî to hetaw e! 84
Ramûsan 85

Beşî sêyem: Pêdeştî pexşan 87

Reşebayekî çemûş û beyanîyekî taze 89
Rojî jin.. rojî gulleberrojekan! 98
Mirdin be cilkî serbazîyewe! 108
Mergî goranîyekî spî 110
Razêk le gell "ba"-yî tişrîn da 116
Hellebce û gerranewey darhenarekan! 119

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Pêşkeş e be:

Şefiqe Se'îdî westa Hesenî westa Mihemedî Fatme Xezayî.. Daykim ew jine pîrozey ke bo yekemîn car le şewe tarîk û nwutekekanî jîyanî mindallî da, cirîwekanî xoşewîstî jin û azadî û pirşingekanî zimanî kurdîy û towî wirey bo berengarbûnewey hemû zullim û dijwarîyek le rohima çand..

ŞÊRKO BÊKES

Witeyek

Em komelle şî‘r û pexşaney le ber destan da ye, beşî here zorîyan diwa be diway qesîdey "rengdan" nusirawn û hendêkîşîyan le katî xoy da bi-lawkirawnetewe. Nawnîşanî dîwaneke "Xom.. Ew wextey ballindem!" nawnîşanî kurteşî‘rêk e ke ebête tazetirîn şî‘rî em berhemeyiş. Ewey rastîş bê lem kare niwêyem da xwêner be asanî hest be we ekat ke le awênekanî em care da hest û nest û meraqe taybetîyekanî xom, be kurtî dinîyay nawewe û hemû xeyall û riwanînekanim rûnitir û aşkiratir derekewin. Eşa lem riwewe eme dîyartirîn cîyawazî em dîwane û henda le dîwanekanî tirim bêt.

Le rîzbendî nawerrokî em kitêbeş da, wam be çak zanî deqekan bikem be sa beşewe yan bîyanxeme sa telanî cîya cîyawe û belam be hemûyan herîyek bax û hewarîyan hebêt:

Yekem: Kejî şî‘r: Taybet be şî‘redirêjekan.

Duwem: Ballinde biçkolekan: Taybet be kurteşî‘rekan.

Sêyem: Pêdeştî pexşan: Taybet be pexşan û pexşane şî‘r û peyveşî‘rîyekan, ke min bo xom bo her yekêk lem janrane lêkdanewey taybetim heye û be şêweyekî gişîtîş ewey şî‘r le pexşaneş‘îr cîya ekatewe. Ew mosîqa û ahenge ye ke le zimanî ewîyan da heye û lemîyan da kemtir yan nîye. Dillnîyayîş im ke xwêner eger be selîqey xoyîşî bêt le wextî xwêndinewe da hest bem cîyawazîyane ekat. Eme le katêk da, manay ewe nîye le nirxî efirandinî pexşan û pexşaneşî‘r kem bikeynewe. Çunke hergîz îbda‘i û dahênan taqe mallêkîyan nebuwe.

ŞÊRKO BÊKES
Silêmanî
27/2 2002

Beşî yekem: Kejî şî‘r

Le rarrewe nisirmekanî leş da

Le nakawê "ba"yek be xar
Hat û be lam da têperrî û.. le nakawê
Herdu ziney xwar tewêllmî
Pirr kird le gerdî tep û toz..
Lêllayiyek le binewe..
Şilwêbûnêk le roşnayî serçawewe.
Hewrê le xoll
Deştê xubar.
Lêllayiyek bere bere hat û kişa û
Hat û xiza û, xoy lê dam û
Pertpertî kird temaşam û
Sêberî xiste ser çawim!.
Laskî serincdanî birrîm
Temaşamî kurt kirdewe

Wek riwanînî kurteballay
Êwaranî pişt le zerdey
Ber kewêllêk!
Lêllayiyek
Wek seretay engoreyek
Ber le bawêşkdanî şew û.
Yan tem û mijî kenarî
Zînde xewêk.
Tarmayiyek
Wek derkewtinî killoyek
Le xellûzî tarîkayî
Yan tîlmaskê le reşayî şîwenî çem
Yan xawbûnewey tiwêjallê le meraqî qelerreşke û,
Pelleyek xem
Kewte berayî asom û

Naw spêney dîdekanim!.
Şilwê bûnê
Hellmêkî tenik le zarî bûlêllewe
Wek teyrêkî efsaneyî hate derê û
Ballindey şûm le pirr ballî
Xollemêşawîy cullan û hewz lîxin bû
Xoy diyar nema û tirawîlke
Le heterêkî dûrewe
Hengaw hengaw nizîk bûwe
Be espayî her le naw tep û tozewe
Be ejnokanma hellgerra û
Ta nêwçawim hate serê!.

Toyş her ew kate peyda bûyt
Toyş ew sate legell gerdû
Legell hellm û legell tem da
Hatîte nêw çawanmewe! Bo peyda bûyt?!
Wextê hatît
Ke min çawim le wirdekarî ciwanît û
Le tallemûy naw xeyallit û
Le pîte zor wirdekanî
'Eşqit nebê..
Wextê hatît
Ke min çawim le tan û poy rengekanî
Pêkenîn û le dezûley zor barîkî
Amajekanî nîgat û ke min çawim
Le hatûçoy wirde şepolî naw leşit û
Le tallemûy becêmawî qijit nebê!.

Emêsta dêyt?!
Emêsta to egeyt gullê?!
Direngane
Direnganî tenyayî me
Direnganî çawim.. Gullê!
Direnganî rûnakî me
Lem rarrewe nisirmaney leş da.. Gullê!
Pirtepirtî çirayeke

Le şewêkî bêwejin da û
Le ber heywanêkî çoll da û
Le ber hewayekî sar da.. Gullê!

— Min awî çawmit edemê!
— Bellam Gullê! Em sefere xollawiyey
Naw gerdelûl, em temaşa xollawiye û
Em lîxinbûnî serince û em pirtepirtî
Çiraye le ber bagjey'umir da, qederêk e û
Seferêk e û serabêk e û ebê herbê.. axir
Gullê ebê her bê!
— Min awî çawmit edemê!
— Bellam Gullê!. em çûne naw tirawîlke û xubarewe,
Em koçe xollemêşîyey qaqirî leş, xohellkêşan
Letemtûman, werînî perr, werînî roj, werînî
Çaw, kizekizî ba pûskekey naw rarrewî bîrewerîy,
Kallbûnewey rengî xwên û zerdhellgerranî
Awêne û fesllî xezanî demûçaw,
Çall û çollî henasekan, mandûbûnî
Xuliyakan û mosîqayekî hêwaş û henasebirrkêy gellakan,
Ebî her bêt, axir Gullê ebê her bêt!
Axir Gullê em sefere ebê bikrêt!
Ebê xaw bêtewe tîşk û sard bêtewe agirdan û
Wirewirî xollemêşîş dest pê bika û lerzelerzî
Dest û penceyîş jûr ka û xwar ka û tem û mijîş ser
Dagirê, kursî bibête hawser û, çend tabloyek
Be mindall û be ferzend û, baranbirran.. xxirîn car
Baranbirran le asmanêkî tellix da her ebê bêt!
Dîsanewe le diwa werzekanî leş da, le kelêkî
Werrsewe, le delaqey temenêkî qirçokewe, diwa
Payizîş ebê ser bênête derê û diwa rojibaş û
Diwa şewbaşman lê bikat û bellam be cêşman nehêllê,
Ta le gell xoy da eman bat bo ew dîwî şarî xewn û
Bo naw efsane û nehênîy memleketê. Axir Gullê ew
Nadyare her ebê bê. Le diwa zistanî leşîş da,
Xamoşbûn û kizbûn be diyar sûtanêkî hêwaşewe,
Be dem tiwanewey cestewe wirdewirde ta egate ser

Bine mom. Her ebê bêt. Çawbirrîne nuxtey nadiyar,
Xohellwasînî xeyalle sîsekanman be tenafî raburdû da,
Hêdî hêdî, roçûn roçûn û nuqimbûn
Be naw şewgarî lîxin da her ebê bêt.
Em sefere ebê bikrêt!
Ta hellsanî mîwanekan, çollbûnî mall,
Ziringanewey bêdengî, manewey taq û tenyayî xom
Her ebê bêt!. Her danîştin û danîştin be yekewe xom û
Endêşe çirrekan. Bîrçûnewey zor liq û pop. Her
Danîştin û danîştin le penayekî nisirmaw naw be nawê
Miyawandinî pişîleyek le jêr mêz da û yan hellçûnî kitliyek û yaxud xişey rojnameyek,
Ke gileyî nexwêndinewem lê bikat û,
Givegivî reşebayekî tirsinak le derewe,
Wek pêm billê: To danîşe û sefer xoy dê!. Lew dîw
Şûşey çillkinewe serleqandinî direxte, her ebê
Bê. Her xom û xom. Xom û xeyalle sardekan.
Xom û baziney dûkell û xom û meraqî lakêşî
Jûrekem û pencereyekî çiwargoşey ser hewşey
Çoll û.. Le dûr qîrrey qelerreşê
Her ebê bê..
Axir Gullê
Xot sîs meke
Axir çawim..
Guman lem qedere nakirê û
Her ebê bê!

Silêmanî
25/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Daykim.. Lewê, le pişt oqyanûsekanewe!

Lem mêjûwe sarde da.. daye!
Lem zemane befrîne da
Koçî dûr bo?!
Seferî win û nadiyartir le çarenûsî pûşêkî
Dem gije ba û.. seferî wêlltir le towî
Peragende û le kişanî estêrekan.. bo?!
Lem zemane xemsarde da.. lem
Zemherîrî koçe da.. cêhêştinî xoretawe
Hejarekey girdî yare û askekanî kanêskan û
Bizirbûnî dengî goyje û.. temawîbûnî neynokî
Çawekanit û înca giryanî xeyallit lew dîw oqyanûsewe
Bo?!
A lem mêjûwe xemsarde da..
Ke tenyayî û serî lerzok û wirrênet
Le suçêkî yadgar da kizkiz be diyar
Momêkî spîy bêkes û
Şewq lerzîwewe bigrî..
Bo? Daye bo?!
Befre û kilû le gînglîî sema da ye û
Kat tezîwe û jûrim le textey ser aw û
Çawim le billqî kefêkî lêll û pêll û
Hestim le şextey şkawî zeryakan û,
'Umrim le nizîkbûnewey pepûleyek
Le billêse û leşim le peykerî lim û
Xewnekanîş le dezûley piçirraw eçin..
Em koçe bo?
Xewêkî kurt kurtman heye û benderî diniyayîş
Dirêj û hajehajî milyon salley hêşta
Genc û hêşta qît û gurrî dawên dêt û eçê..
Cestey êmeyîş agirdanêkî kujaw e û çawman
Asoy hellmawî ye xeyall belemî şikaw û
Reng gella gella ewerê.. Rûkirdine ew dîw
Oqyanûs, ew dîw nadiyar, ew dîw
Winbûn.. bo daye! Bo?!
Le ber pencereyekî dillteng û rû le

Hendê darî pest û werrs,
Le mubeqêkî barîk da wek tîtirwaskê
Ball zamdar dêyt û eçî û ewestît û
Şûşe bendî ser ballqonî
Be hall zerdexene girtû.. ekeytewe û..
Errwanîte hendê simorey bizêwî xwarewey
Naw kilorî pîredirext û giwê le zîqey
Hendê teyrî tîj têperrî asmanêkî misîn
Egrî û serî setllî tirşiyateket
Ekeytewe û be hall tamêkî ekeyt û
Sermay demtîj rawit enê û ebît be meraqêk kurr û
Dêytewe naw mubeqeke.. Feqyanekanit hellekey
Em careyan eçîte ber borî awêkî zor har û
Hacet eşoy, xeyall eşoy, xem eşoyt û
Sall eşoyt û nabirrêtewe. Dêytewe ber selaceke,
Eykeytewe û day'exeyt û meraqî bestû wek goştî
Naw firêzer der'ehênî û eykeytewe û dîsanewe
Xemî taze zerif zerif exeytewe naw firêzer!
Koçî dûr bo?!
Bazneyek e û hemû roj tiya xul exoy.
Bazneyek e le seholl, bazneyeke le dûkell,
Bazneyek e le janî pilastîkî û tiya xul exoy!
Koçî dûr bo?! Seferî naw zeryay dirru
Siwarbûnî mewcî lasar û tûnaûtûnî temtûmanî
Naw qallibî konkirêt û henasedan le naw hewayekî
Reş da û, rojjimêrî çoll û hollî, ew
'Umre bo?! Koçî dûr bo?! Axawtin her
Le gell xot da, le gell likî feqyane da û,
Le gell tirşiyatî ballqon da û le gell çizeçizî tawe û,
Le gell qirçeqirçî naw henaw da bo?! Bo?!
Lem cîhane xemsarde da
Lem zemane pertperte da
Em koçe bo?
Le pişt oqyanûsewe to
Le darbîyekî bizirî naw tem û mij eçît.. daye!
Le melêkî kiz hellnîştûy payizaney wextî mexrîb!
Le gulldanêkî bêtaqet.. le çîrokêkî bêgiwêgir..

Em koçe xollemêşiye û
Em seferî firmêskane û
Xewzirranî estêre bo?

To lew dîw oqyanûsewe
Le şepolêkî zor mandûy bestên eçî
Wextî daçûn!
Hawrrêy to! Êsta le wê
Hendê dirextî bêzar û
Hendê simorey kilkzerdî fircînya û
Hendê teyrî lanewaz û..
Hendê rêbwarî ser cadey çoll û holl û
Hendê pencere mallan in
Em sefere le gell kirrêwey temen da..
Em koçî ser bestelleke û
Le naw em xewe kurte da
Em sefere dirêje bo?!

Dêytewe ber pencereke.. Eçîtewe ser ballqone
Piçûkeke û temaşat awî şilwê ye û çawit lê ye
Reşebayek hewrêkî dûr çing le ser şan
Raw'enêt û wijewijêk le derûnî darekan û
Le derûnî xoyştewe dêt. Tawêk baran
Le derewe le gell tawê firmêsk le nawewe le naw
Serta be yekewe da'eken û ew pûşî
Zerd terr ekat û emîş gullî
Lare milî ser kirase kurdiyeket û.. le serewe
Bo xwarewe şepqe û pêllawî
Dû rêbwar ebînît û giwêt lêyane û tênageyt û
Dîsanewe le kilorî pîredar da simorekan
Bedî ekeyt, çend giwêzêkyan bo hell'edeyt
Giwêzekan xilor ebinewe û her heman sat
Toyş belkî feqyaneket çend dillopêkî xilorî
Ser rûmete qupaweket esirrît û dêytewe ber
Selaceke û eykeytewe û day'exeyt û,
Wek pîredarekey xwarê le berdemî gijeba da
Mandû ebî û, ewsa le ser kursiyekey xot

Da'enîşî û zerrebînêkî çawgewrey kilkdirêj
Be destewe û.. dîsanewe le nûkewe.. yeke
Yeke seyrî hemû wênekanî naw pîreelbûmit
Ekeytewe, seyrî kurr û kiçî dûr û, seyrî şarî
Gelê dûr û, seyrî kiçeza û kurreza û, bûkekan û,
Seyrî bextî le awêney şikaw çût û.. dillop
Dillop seyrî rewtînî ballat û rûtanewey perr û ballit û
Hellwerînî se'etekanî rojanit û wirdûxaşbûnî
Xermaney ber pêt ekeyt.. Elbûmeke firrê edey.
Em careyan nexoşiyekanit be pence ejmêrît û be yekewe
Azar û heb û yadgar ebeyte naw pêxefewe..

Le pirrêk da îtir pêllût
Wek ballî şilî pepûle enîşêt û
Azar bo maweyek enwê û
Înca xoyşit wenewzêk û xewêk dêt û
Zerdexeneyek eçête naw spêney ew xewe û
Le gell hewrêkî hêminî ser zerya da
Egerrêytewe bo laman!
Lem zemane xemsarde da
Lem zemane befrîne da daye!
Koçî dûr bo?! Seferî awî amûn û
Siwarbûnî mewcî dirrinde û demkirdinewey qirşekan û
Bahozêkî şêt û wêt û, belemêkî bê çarogey
Em sefere û qisekirdinî xot û xot,
Xot û mubeq, xot û simore û pencere û
Xewbînîn le naw elbûm da û xewbînîn le naw
Seholl da û çawerrwanî le naw cantayekî qull da û,
Henasedan le naw lûley konkirêt da..
Takû key bo?!
Lem mêjûwe sarde da daye!
Lem zemane befrîne da daye!
Koçî dûr bo?!

Silêmanî
15/2 2002

Çaw le rêy rojhellat

Le ziman jûrekey tenyayî û
Qesîdey weswasî şewewe
Ballindey xew ellê..
Le ziman zemanî serab û
Se'atî nadiyarî koçewe
Posteçî şipirzey "ba" ellLe ziman şebengî rengewe.. engorey bêwazî xornişîn,
Hatûçoy guman û.. hêllhêllî werzekey le yektir dabirran, Sêber û boşayî û xallxallî zerd ellên..
Le ziman tarmayî şiwênewe..
Dirextî şeketî çawlerrêy û temaşa temawî û,
Girdollkey çiwar mişqî danîştû le deşt da û
Berd ellên:
Ellên dêt
Be xoy û baweşê pepûle û xemewe ellên dêt..
Çun darî bellalluk xoy allall
Pepûle qetiranî û
Xem spî û
Ew cestey yek feslle û
Heman kat çend fesllê enwênê!..
Le pirrêk hellalle baran e le mêrgî naw qijya û
Le pirrêk kanîyek pepûle payîze
Le singîya hellequllê û
Le pirrîş peykere zuqmêkî kejan e û
Tenya ye û bêkes e û eybestê!
Ellên dêt
Wek kilûy ew befrey
Kizeba bo semay tiwanewey
Ber şewqî pencerey dilldarê eyhênê.
Eybînim: Çend lêy dê be şewî mangeşew

Gullan û xezan û befranbar pêkewe epoşê.
Ellên dêt..
Wek ewîn le pirr da egat û
Pêş êreyiş, bigate her şiwênê
Ew wextey ke hesta
Le diway xoy zineyek le awî pemeyî
Rûnak û dû tellîş le gullî reşpoşî
Behare bo ’eşqî xerîban cê dêllê.
Ellên dêt..
Be dizîy se’at û wextewe
Xoy ekat be şiwên da û be mall da û
Be dizîy rojewe
Xoy ekat be şew da û
Be dizîy reqîb û merzewe
Hell’efirrê û nahêllê çawî pîs
Le sîley ciwanî da bedî ka û nahêllê
Awî reş bîbînê!
Elên dêt..
Ger rêgey rojhellat aqarî
Seferî payîzey ‘eşqî bê û
Be tenîşt killûkoy wefayî û
Killpekey hezretî Herîq da tê perrê..
Ezanim bo satê la eda û ewestê û
Le pelkî gullhêroy balakey şîrînî teşîrês
Tacîkê le perrey hesretî geşawe û,
Le lirfey sûtanî herîqîş,
Rûnakîy qesîdey zamdarim bo dênê!.
Ger rêgey rojhellat
Aqarî seferî şînî ba
Dillniyam le binar "zawa-bûk" lê eda û le wê da,
Ew çetrî wenewşey bûkêkî nakam û yan çoxey
Xwênawî zawayek hell’eda û, bo tawêk serxewêk
Le şî‘rî fênikî keprekey Hêmin da eşkênê û
Le xewî şînîş da "siware"-yek, êlxanî,
Be cilî ’eşqewe, sûrmeçin, rakişaw, le kenar
Awêkî sewzelley xemgîn da ebînê!.
Ger aqar şarekey

Mestûre û Jîlla bê û
Le wêwe serî xo hellgirin şeman û
Mamiz û.. le wêwe zirîkey me'şûqan
Le şûrey şimşêrî mîranî Erdelan hellbên û
Çiray Mem hellken û
Ew nawe bikene çiraxan..
Dillniyam le pêş da eçête ser serî Awyer
Ewsake le textî tiropik da
Des le mil hewrêkî nizim da..
Ramûsan le semay ebedîy
Ewîn û siruşt da.. Ramûsan
Le nêwan beyanî û êware û.. gunah û pakijî û
Dozex û beheşt da.. rû eda
Be rûtîy awêney leşî xoy
Beramber xorawam raegirê û
Embînê û eybînim..
Ta ebê be kilûy naw şî'r û
Yan terzey pexşan û
Yan gullî ber baran!
Ellên dêt.. Min êsta berdemî pencerem girtuwe.
Ne baran qiseyek ekat û ne kilû wişeyek
Enûsê û ne hewa çirpeyek be giwêm da ekat û
Ne rêgey rojhellat le ber tem ebînim!
Tenyayîm wek şûşey çawîlkem hellmawî û
Jûrekem wa enwê û.. Xudaye! Ew key dêt?!

Silêmanî
4/2 2002

Dûrîyanekan

— 1 —
Le ser ra giveyek hat û be zor gullebaxêkî
Rût û qût kirdewe. Le jêllawe tem û mijêk geyişt û
Be zor çarşêwêkî be cogeyek poşî. Le lay
Rastewe miqestêk hat û be zor serî
Qesîdeyekî girt û pirçekanî birrî. Le lay çepîşewe
Dûkellêk geyişt û be zor nameyekî peşîmanî be
Samallê nûsî!, belam ewey ne be zorî give û
Ne be zorî tem û mij û ne be zorî miqest û dûkellîş
Dirust nekira; xoşewîstî bû!.

— 2 —
To lew serewe be tenya errwanît û le mange şewêkî
Zîwîn eçêt û minîş lem xwarewe be tenya û le
Gomêkî xollemêşîy xemgîn. To lew serewe
Le hewrêkî nizmî pêşbarîn eçît û minîş lem
Xwarewe le darlîmoyekî bêaramî çawerrêy barîn.
Mang le seferda ye û hewir koç eka û lêre namênê û
Darlîmo le xak da û.. darlîmo min im û nageme mang û
Nageme hewrî çawşîn!.

— 3 —
Her be namekey diwênêta, çirayekit bo nardibûm biçkollane.
Minî tarîk ke hellimkird, le awêney beramberma,
Xom bîniyewe mêjûyekim le tarmayî ew piyawaney
Çirayan kuşt le naw jin da. Her bo ewey: Ne pepûle û
Ne perwaneyek nemênê be dewrî ‘eşqa xul bixwa û,
Le diwayîş da rîşekan û çeqokan û pelle xwênî ser destî
Piyaw le awêney beramber da bizir bika!.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— 4 —
Taqe şewêk bû, ke çî bû be koy hemû şewekanim.
”Ew zeman û min ’aşiqê” taqe xemêk bû ke çî
Bû be koy hemû xemekanim. ”Ew îşraq û min
Xellwetê” yek wişe bû le pirr da bû be ferhengê.
”Ew deryaçe û min belemê” yek pizîzk bû,
Le pirrêk da bû be girrê. ”Ew çawig û min pengirê”.
Yek binçik bû, le pirrêk da bû be kejê.
”Ew şî‘ristan û min Melê”

— 5 —
Taqe bulbulêk etwanê, daristanê çend gewreyîş bê,
Way lê bika giwêy bo bigrê. Taqe qellemêk etwanê
Le kaxezî ser mêzêk da, çîrokê bika be zerya û,
Îtir zeriyayîş le gell xoy da, çawî cîhan û xwêner û
Ballindekan hemûy berê. Birûskeyekîş etwanê,
Be yek çirke perde le ser tarîkayî hezaran salle
Laberê. Tenha jinêkîş etwanê, wek ew jiney
Xoşim ewê, wam lê bika weku êsta, wişem bika
Be bulbul û, naxim zerya û xulyakanim be birûske û,
Ta hetaye ewînîşim tê da nemirê!

— 6 —
To le gell şew da hatbûyt. Be kilîlêk, dergakemit,
Kirdbûwe. Be çirayek, jorit ronak kirdbûwe.
Be gullawêk cêgemit bonxoş kirdibû. Bellam
Axir, ew kilîle, dergay hestî nekirdmewe.
Ew çiraye, xemî ronak nekirdmewe. Ew gullawe,
Bêzarîy bonxoş nekirdim. Hêşta her le rohma
Şew e û, hêşta her roj nebûtewe!.

— 7 —
Beyanît baş! Baranekem! Emrro wişk û laremil û
Darsêwêkî bêtaqet im, erê nayeyt tozê be serma
Bibarî û em werrisbûnem aw bidey?! Beyanît baş
Hetawekem!. Emrro rohim sermayetî û darbîyekî
Kizollem û hell’elerzim, erê nayeyt, lew berewe

Her bo satê çawekantim nîşan bidey?!. Beyanît baş
Ferhengekem!. Emrro zimanim bestirawe û xeyall dergay
Pêwedawe û şî'rîşim le bîr çotewe!. Erê nayeyit,
Tuxwa nayeyt, bo tenyayîm tozê bidwêy, deng û
Rengim burujênî û, beşku minîş lay xomewe,
Wek ciwanît û dem û lêw û pêkenînit, carêkî dî,
Be qullequll hellqullêm û bo sallî niwê û bo şî'rî niwê
Wek samallî dem û çawit bikrêmewe!.

Silêmanî
Kotayî sallî 2001

Bo yanze tabloy hunermend Namîq Elî Qadir

— 1 —
Şepolanî efsane ye?
Ya rêgeyek
Le cestey ziryan û kafûr!
Merg e errwa?
Yan jiyan e daegîrsê û
Bûwe be xewnêkî deycûr?!

— 2 —
Ballindeyek le şewgar û
Mirov le berdî sersamî û
Temaşam pirsiyar û
Welamîş bizir e!

— 3 —
Şî'rim le xewya to wa ebînê:
Bêdarbûnewem bêrengim eka û
Min ewerênê!.

— 4 —
Le tenyayî da
Serinc nadiyarê exwênêtewe
Pirr e le cadû
Burcî 'eşiq mang e û
Star e wişe û
Namoyîş ême enûsêtewe!

— 5 —
Ke pûre wişe burujê
Şewî mana bê kenar e û

Wêne efirrê û
Lêkdaneweyîş bê sinûr e!

— 6 —
Çend sede le perro.
Çend sede le kiwêrî.
Çend sede le serî bêbaran
Aya toyş her min î?!
Embînî?!

— 7 —
Eger bidwêm
Em dem û çawe koç eka û
Em careyan ebime befir û
Spî edwêm!

— 8 —
Le ber pencerey xemêk da le xwarewe
Her newrese û şî‘r enûsê û to naybînî.
Le ber rêjney baranî rûnakî da le serewe
Her azare û ball egrêt û to naybînî.

— 9 —
Xor le colaney mang da ye û
"ba"yekî reş rayejenê.
Çirpey ewîn le denûkî du mel da ye û
Goy memkêkîş le ser darê pê ekenê.
Nîwem teyrî dastanêk e û
Nîwem ’Eştar
Min hendê car
Ebim be gullî balldar u
Carî tirîş be zê û rûbar!

— 10 —
Ke ‘eşiq şimşall mest eka
Îtir pepûle baranê dest pê eka û
Kes nazanê çi wextê xoş ekatewe?!.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— 11 —
Mangî mart ekujrê û
Dirextê namênê şayetîm bo bidat!
Pel û poy em xwên û tawane
Hênd dirêj.. Hênd çirr e
Serêkî eweta le qubbey xwawenda û
Ewî tir le şarî bizir da
Deryaçey agir e!

15/1 2002

Mehall

Bo hemû ew kellepiyawaney ke le şerrî dijî şewezeng û tîrorîstan da bûne çiray qurbanî!

Pêyan billên:
Rûnakîyek lêre ejî
Jûrekanî le "çaw" da ye û
Pencerekanî le "ser" da û
Baxçekanî le rohman da û
Şeqamekanî le destî hemûman da!
Pêyan billên:
Azadîyek lêre ejî
Şellallî gull û mindall e û
Rengalley jin û rûbar e û
Pirr e le nimey zîwîn û
Gimey spî!
Pêyan billên:
Bo sibeynêş kejaweyek be rêwe ye:
Pirr e le şî'rî narincî û
Pirr e le note û le terze û
Bejnî le bejnî kejan e û
Qijî le awî pemeyî!
Pêyan billên:
Ta geyiştûyne em mêrg e û
Lay pirçî kallî Hebîbe û
Berdem narewenî Nalî
Be rêgewe
Hezar hezar kanîman lê kujra û
Be rêgewe
Hezar hezar goranîman req bûnewe û
Hezar hezar estêreman wird û xaş bûn!

Pêyan billên:
Ta geyiştûyne em şare û
Berdem şeqamekey Qudsî û
Lay çirakey Emîn Zekî
Menzill.. menzill
Sallanman kirdote koll û
Menzill.. menzill
Mangeşewman le birîn da hellkirduwe û
Menzill.. menzill.. eşkenceman rajenduwe û
Lem serewe
Qonax.. qonax, bûyn be hellm û
Lew serewe
Perre.. perre, gullalleman baranduwe!.
Pêyan billên:
Be şemşemey "zillumat" û
Be kundepepûy rîşin û
Be dallekanî Bin Ladin. Pêyan billên:
Wek mehallî gerranewey
Dem û çawî rojjimêrî
Emsall bo par..
Çon mehallî gerranewey
Ziringey zeng bo naw "zeng" û
Gellay werîw bo liqî dar
Yan mehallî gerranewey
Gillopî serî Edîson,
Bo naw eqllêkî tarûmar
Em rûbarî ber hetawey dengî ême û
Rengî êmeyîş
Hîley awî em çirkeyeyîş
Carêkî tir nagerrêtewe bo gerûy
Zemanêkî lew berî rox û kenar
Deng hell'ebirrim:
Hemûtan werine derewe û
Mall cê bêllin û rûyîş bikene
Gullpemûy rîşî Mewlewî û
Siyaçemaney xemgînî Hewraman û
Befrî reşpoşî jinan û

Pêyan billên:
Be cundekanî mirdin û
Pasewananî heşîşe û
Bikujanî ballindekanî mosîqa û
Gullekanî kakollî jin,
Pêyan billên:
Herçî şimşêrî tarîkîy kemertane, hellîkêşin
Paşekişe be tîşkêkî gizing naken!.
Pêyan billên:
Em dinyaye
Êste tabûta çê eka bo tîror û bo şewezeng
Efxanistan çend dirêj e ewîş hênd e û
Be qed Êraqîş pan û porr!
Pêyan billên:
Xorî ême
Çon çawî Xiwa û
Awî rûn û
Pîrozîy jin
Dillniya ye û
Pêyan billên:
Cêgey êweyîş le suçêkî
Ew tabûtey cîhan da ye!

Silêmanî
26/11 2001

Pia

”Leş ba herdey beharîş bê arayiştî
Asmanêkî ewê ferr ba be giştî!”
Goran

— 1 —
Ew şewe, le derê, şewêkî spî bû.
Şaqullîş: bo serê, hallawê
Le singî xişt rêjî şeqam û
Le zarî peykerî şa’îrê.. hell’esa
Hallawê, hellçûnî xemawî û
Henawî tenik û
Rengekey: şîrî bû.
Ew şewe, le derê, rûnakî sermay bû.
Şa’îrî ser sekoyîş, tenyayî naw, gorrepan
Destêkî wa le ber piştên da û
Ser şepqe û, nawşan û, tozêkî ber simêll
Befrawî û.. çawerrwan:
Wek ewey çaw le rêy hatinî
Dulberî xewnî bê û yan perî naw şî‘rî
Şipirze, berew xwar, ta berî ewberî
Pirdeke eyriwanî..
Bellam kiwa?! Eweta diwa daney gillopî
Jûr serî dagîrsa û..
Wa êsteyîş, be pele, ber le xoy, sêberî
Geyişte pirdeke û..
Bellam kiwa?! Be pir da ne perî û ne dulber
Ne xewn û kes naye!
Ew şewe, le derê, tenyayî sermay bû!.
Beramber pirdekeyîş: darêkî pîremêrd
Yek qaç û şanî kûrr

Bê wey û be tenha le qerax cadeke westabû
Kirasî liq û pop dirra û, killawî kunkun û
Çawîşî le ême û le jûrî apûre birrîbû!.
Embînî, le derê, embînî..
"Ba"yekî bêîşî şerranî
Demûçaw xolawî
Naw be naw le nakaw ehat û be enqest
Şanêkî riqawî lê edaw
Pîremêrd le qijî rûtawey ewerî û
Le ser laretêkî ebird û.. neyîş'ekewt
Pîremêrd, qaçekey, be qullî
Be cestey zistan û be şewî spî da roçû bû.

— 2 —
Ew şewe, le jûrê
Şewêkî şerabî allall bû
Ew şewe, le jûrê
Arezûyîş wek Fodka germay bû.
Le çiwar la û, bo ser ra û, ellqaûellq
Pirtepirt, qetarey, gillopî dagîrsa û
Birîskey rengawûreng
Car be car wek binûn zor kiz û xamoş û
Le pirrîş hatinewey şewqî tîj
Temaşay eşllejan!
Ew şewe le jûrê
Şewêkî pişkoy allall bû
Cesteman pengir û
Holleke miqellî û..
Be sirwey muzîkî romansîş, baweşên,
Seretay le ser xoyhellbûnî şemall bû
Ew şewe le jûrê..
Şewêkî şerabî allall bû
Le pirr da
Miqellî tawî send
Mosîqay be killpey reştalley zinciyekan
Coşî xward..
Mosîqar: Payeyek le xellûz..

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le wextî jenîn da..
Dû çawî kirawe sê beşî spêne
Dû gupî hellawsa û ta bin giwê pirr le fû
"Seksîfon" "tirampêt":
Hendê car be zîkey dirêjî wekû mû barîk û
Çon ellmas tîjewe..
Tîskebûn, der'eçûn..
Hendê car
Dengekan temell û pan û porr
Yan qebe û, qellew û, girr ebûn
Embînî: le wextî jenîn da
Zengiyaney wirdwirdî areqyan
Be textî tewêll û, serkepû,
La cangî mosîqar der'eda û
Band dûr û, lew sere û
Sî ewan bo nîwgup heway ziyad
Egerra û, keçî min
Le cêgey xomewe henasem siwar ebû!
Le jûrê ewînîş wek muzîk germay bû!
Yek mêz û
Çiwar dest û
Dû şûşe şerab û
Dû kasî mildirêj le şêwey zerrafe
"Mêzeke pemeyî û xallxallî spî tîşik
Kerwîşkey tiya ekird!"
Dû destî tukin û
Dû destî naskolle û
Diway dû "noş"
Pênc pencem, pênc pencey..
Eçûne mabênî yekewe..
Heman sat
De penceyîş, ta lay çaw
Dû perdax hell'ebirrin pêkewe!

— 3 —
Ew nawî Pia ye
Ballinde jinêkî perrzerdî Swîde û

Hêlaney spîşî rojnamey rojane û
Berayî firrînî asmanî ser hemû dinya ye..
Jinêk e, yan billêm, awêk e bê şillpe û bê xurr e û
Sûk edwê wek şine û
Kem edwê çon nim e û
Ke eyşdiwê le binî em awe rûne da:
Le manay dagîrsa û perrekey masîyek
Ebînî sersamker xwênşîrîn le dilla.
Yan geray wirdîley bin berdî
Qullayî ebînî, ew demey ke şaney
Paşerroj da'enên le 'eqlla
Yan gizing ebînî ew satey enûsê.
Yan xende ew katey wek gullêk
Le aw da ebzwê û lerey dê!.
Xwêndinewe, seferî hemîşey Pia ye
Xwêndinewe, nuqimbûn, le awî kitêb da
Pia ye..
Be pê bê û
Be wişey otombîl
Be ristey qîtar bê û
Be gemiyey kewane û
Be siwarî firrokey nawnîşan..
Ew errwa û nawestê..
"Xwêndinewey zamî reş
Le qarrey azar da.
Şewêkyan ew le gell
Şî'rêkî pêstreşa
Destiyan kird be sema
Zerd û reş têkell bûn
Le rengî muturbey ew dûwane
Rengêk za
Weku xor bê sinûr
Gişt cîhan egerra!"
Xwêndinewey birsêtî
Le gullî genim û coy kujraw da
"Ew roje" Piam dî
Dû memkî jinêkî somallî

Le gell xoy egêrra
Memkêkyan dexîle û
Ewî tir kotirêkî mirdû bû
Be yekem yek be yek
Le dergay befrînî paytextî xoy eda û
Be duwem.. ballindey
Cîhanî ewrujan ".

— 4 —
Ew şewey, Pia bû, be momim
Min hêşta qesîdey tarîk û nûtekî
Baxçekey daykim û dû çawî kujawey
Mewlewîm le gell bû!
Ew şewey, Pia bû, be awim
Min hêşta tînûyetî diwa satî henasey
Kirrûzey semelî genim û com le gell bû.
Ew şewey Pia bû be bonî aludey xerîbîm
Min hêşta her bonî, dûkellî, keziyekey Menîc û
Min hêşta her bonî miskekey askêkî kujrawî şêrwane û
Min hêşta her bonî xenekey dest û pêy
Bûkêkî yek şewey "gulan"im pêwe bû..
Ew roje Pia hat
Le mişkî keziyekey Menîc û
Le miskî mamiz û
Le xene û dûkell û xollemêş
Momêkî dirust kird kelleget

Hellîgirt birdiye naw kawlaşî yadmewe û
Lewê da hellîkird!.

— 5 —
Ew eywit:
Le her cê û her aso û her kelê
Ta heway jehrawî bosey xoy
Bo reng û bo tîşk û bo firrîn dabinê
Qellemim melêk e û

Nefesî teng ebê û
Rojnamem baxêk e û
Henasey egîrê!
"Birrwane ew hemû
Xezanî mirov û xezanî balldar û
Werînî ew hemû çawane
Birrwane pêdeştî ew hemû
Estêre mirdiwane!"
Ew eywit:
Awêne û nîştiman le kollman
Şêwey ‘eşq le kiwê bê awênem lewê ye!
Rûberî yek willat..
Bo semay, gerdûnîm, zor teng e
Min cîhan cesteme û
Pênasem teyrêke hell’efirrê û
Her rojey eçête ser liqî willatê û
Regezim şebengî sed reng e.
Hefteyek min befrî Swîd im û
Hefteyek direxti kubî m û
Hefteyek min xellkî Riwanda m
Hefteyek goranî hîndî m û
Hefteyek kewêkî Kurdistan!

— 6 —
Pia bû
Jinêk û dû balla
"Ballayek bo germî ew leşey
Le zuqm û şexte da arezûy cûtbûnî
Girr eda û
Ballayek bo ciwanî ew hizrey
Berew jûr, be peyjey estêre û pirşinga,
Hell’ekişa!"
Jinêk û dû dillîş
Dillêkyan her bo xom lêy eda û
Dillêkyan bo zerya.
Jinêk û sed sema:
Semayek be rûtî bo ‘eşqim û semay tir:

Bo xemî ballinde û bo janî direxť û bo kostî
Awêk û bo nûzey nanêk û bo cejnî pepûle û
Çoleke û bo cejnî mindall û kerwêşk û bo şanoy
Pêstreş û bo yadî dû askî dilldar û bo
Dexllî ber baran!.. Semay tir.. Bo kotirî bêwejin
Bo kanî û bo kiç û bo gullî bonxoş û huzaran
Berdewam semay tir berdewam..
Pia bû, momejin!
Ew be roj stûnî rojname bejnî bû
Şewanîş egerra û
Le her şiwên tarîkî bidîyaye
Ew lewê esûta û
Esûta û
Esûta!

Silêmanî
Eylulî 2001

Le şemmeyek da

"Temen rû bo xezan errwa keçî gerdûn ewa taze
Le wêraney dilla toyî gullî dilldarî errwênê!"
Exol

Şemme bû. direxti şemme bû. sêberî şemme.
Çillêkim yadî cejnî le daykbûnî
Gullêkî xoy ekirdewe:
"Momêk.. dîlanêy ekird û
Pepûleyek.. maçî ehêna û ebird û
Gellayek.. nuqllî egêrra û
Awazê.. pirçî pelkêkî ehoniyewe û
Serliqê.. wêney egirt û
Sertillê.. kartî enûsî û
Sirweyek.. nimey gullawî epirjan û
Pijupoyek.. be dengî berz pê ekenî û
Le sereweyîş:
Pencereyekî pemeyî
Le hewrêk da ekirayewe!"
Şemme bû. awêney şemme bû. hetawî şemme
Melêkim yadî firrînî yekem car û
Yekem ballgirtinî hez û
Yekem jiwanî nêw hewa û
Yadî yekem satewextî
Namobûnî be asman û
Dûrkewtinewey le ser zemîn, ekirdewe!.
Ke hat şemme bû. hawînî şemme bû. le pirrêk da
Serim pirr bû le çirpekanî kizeba û
Nîgam şewqêkî zîwînî têzaw
Baranêkîş le ser şanim be rê we bû
Qiseyekî paraw bika û

Defterêkîş le ber demma çawerrî bû
"Ba"y wişe bê û le şeqam û kuçey dêrr da
Be wijewijî "mana" we
"Wêne" hellkat!"
"Ew " lew dîwî tem û mjî efsanewe
Le henawe nisêyekî qacarewe
Le heremî jinekanî babegewrey Erdellan û
Le qefezî kenariyekanî Mesûre û
Le paşkoy espêkî şînî Zirêbar da bû, hatibû.
"Ew" jinêkî awête ye
Le darbefir û le wenewşe.
"Ew" jinêkî muturbe ye
Le samall û le pirûşe.
Le qerax şar
Reşebayek mantokey le ber dakend û
Le qerax şar
“Bêkes” bînî û
Serpoşî le ser kirdewe û
Sinewberê parçe parçe cilekanî berî gorrî û
Le diwayîş da le ber baxçekey Çêwar da û le ber sera
Dengî "dîlan.."
Baweşî kird be firmêskya û be xozgey da û
Tellî şî‘rî sewzî min û
Qumê le awî heyatî şarî daye!.
Şemme bû ke hat
"Çirke bûbû be şemall û
Deqîqe bûbû be kilûy çawerrwanî û
Se’at be pêdeştî şî‘r"
Ke le espî şîn dabezî û geyişte lam
Hêşta her "heynî" lê eçorrayewe.
Hêşta her "heynî" henasebirrkêy bû lew da û
Bellam şewqî şemmeyekî pîroz
Çon seretatkêy momê
Le gell êwareyekî direng da
Le min da ebirîskayewe!.
Ke hat şemme bû. rûnakîyekî terr, yaqutêkî terr
Xoy kird be jûr da..

Awdaman xeyallî min û
Stiranî Esxer û
Awdaman mosîqay rengalle û
Şepolî deryaçey le ber da!.
"Bê hed " ciwan e teniyayît û ciwan e xemit!.
"Bê hed " "ewcî" şoxêtîte
Le berzayî xerîbî da!.
Bêhed.. bêhed.. jinayetî
Le qullpequllpî ceste da
Fiwareyek e û
Topî biçkolaney çawim be seryewe û
Berz û nizim ser ekat û xwar ekat û
Le pirrêk da
Sîhrî aw û destî fiware
Ta xorinewezî naw qijit hellim eda!.
Min êstake le bêdengî jîlemo da m
Ke embînî, be riwallet wa ezanî
Min hewarêkî xamoş im û min mewsîmêkî aram im û
Sard û sirre werzî reng û
Xollemêşî ser û sîma m!.
To çuzanî le jêrewe û le bin şemmey em roje da
Çi dozexî mang û sallê tiyam da ezê û
To çuzanî kam reşeba le naxewe
Le ser şextey roh hell'ekat!
Min êstake le bêdengîy daristanêkî kip da m û
Ke embînî, wa ezanî,
Give le min da mirduwe û
To nazanî em şemmeye le regewe
Kam bûlere le henawya dêt û eçê û
To çuzanî em şemmeye ke teqiyewe
Çi sallawê û çi sêllawê
Le gell xoy da ehênêt û
Rojekanî tirî hefte çon ra'eda û
Rojjimêrim û zemanî min
Hemûy her ebê be şemme!.
Bêdengî edwê bêdengî
Peyivî mitim weku estêrk

Le binewe hêdî hêdî ziyad ekat û
Peng exwatewe nehênîy!.
Naydirkênim!
Haje sirrî şepolekan, sirrî behir
Betall ekatewe wextê bizirîkênê û
Wextê be dengî berz bidiwê.
Çexmaxe sirrî baran û
Bahoz sirrî gewekan û
Min ewînim bo xellwetî têrramanê
Ra'ekêşim..
Cige le tenyayî xom û
Xoxwardinewey wişekanim û
Xuday şemmeyekî pîroz
Îtir hîç kes lewê nebê!
Çi hawarê le naw bêdengîy min da ye
Çi sûtanê le beheştma û
Çi ziryanê le samallma û
Min êstake, çend sedeyek çawerrwanî
Le se'atî şemmema ye!
Bêdengî edwê bêdengî
Giwê qullaxe tenyayî m û
Zayelleyek lem xamoşiyem hell'estê
Pirre le lirfey agir û
Le mewcidanewey gerdaw û
Le şillpekanî kenar û
Le samî şew
Wextê tofan le baweş û amêz egirê!.
Bêdengî edwê bêdengî
Le nawewe min kûre m û
Le serewe.. befir be serma ebarê
Le nawewe.. min temmuz im û
Le serewe.. min behar im bo 'Eştarê.
Le nawewe.. nêllenêll û
Le serewe.. lerzelerz û
Le bêdengî da deng errwê û
Be pilîkaney şemme da
Nûrî xuda û

Nûrî dîde û
Nûrî eşiq dête xwarê!.
"Ew wextey şî'rêkî hezretî Mehwî
Lew şemme pîroze da be hanay
'Eşqî bêdengmewe hat"
Be şemî şemmeyek, yellday, şewî umirim çiraxane.
Be qetrey xendeyek, wecd im, pirraûpirr gomî îrfan e.
Le bênutqîya min nutqim, epşikiwêt û, dîyarîşim
Le nadiyarîya enwênê û, le sûtin da xemim ciwan e.
Bejnî şemme
Be kelênî xorawa da eçête xwar
Êsta her tozê le qijî û
Her tozqallê xendey diyar e
Şemmey şew e!
Le ser em mêze dillşade
Ke tirîfe perdaxêtî û şî'rîş bad e.
Le ser em mêze dillşade
Ke gillopî, milçemawey, goşey baxçe
Le jêrewe, bela çawê, şerminane errwanêt û
Le pirrêk da (ba)-yek dêt û hêşûy tîşka
Edzêt û be lereler le naw destêkî lerzoka
Eyhênêt û wextê hêşû ber çill û liqî
Direxť û leşî ême û mêz ekewê le cêy xoy da
Pertpert ebê û tirêy tîşk hell'ewerê û
Denkedenkey bo jêr mêz û koş eperrê û
Diyar û nadiyar, tarîk û rûn, nîwey kursî û
Nîwey leşman, reş û spî hell'egerrê
Xoman le yektirî dûr û
Bellam her tozê bew la we
Be gewreyî, le naw çîmen da, sêberman
Bê derbest û, seryan be yekewe nawe!
Bê hed ciwan e pirçî taze hellfirrîwî serî azad
Bê hed ciwan e teniyayît û gerdinî nîwe rûnakit û
Girrî narincîy fenidekî
Nêwan lêw û cigeret û
Xenînewey seferê şad.
Le ser ew mêze dillşade

Min ew şewe, bûbûm, be qellbezey qise
Gella û gullê, laske giyaye, bin dewenê û,
Cê jiwanê û berdê nema
Be çiwardewrî ciwanîy û jin da
Be pirjey roh terrî nekem!
Le ser ew mêze azade
Min ew şewe bûbûm be jêy kemançeyek
Yadgar û xewim lê da û
Goranîm kirde berberd û
Darim jenî û
Le naw gundî pepûlewe
Gull estêrey notem hanî!
Min ew şewe le ser ew mêze azade
Edwam, edwam, hewrim hênaye ser kursî û
Wişem ekird be mêxek û
Ristem ekird be şeqam û
Destewaje be kolan û
Wêneyîş be nexşî derwaze!
Edwam, edwam, gêrranewem le roştin da le berdebaz
Hell'enûta û, le ber şewarey bînînî hezar reng da
Çaw eşlleja û, gêrranewem da'enîşt û gêrranewem
Bazî eda û, min her edwam:
Basî dîrokî dûkell û xollemêşî cestey şî'r û
Qeqnesekey xomim bo kird. Basî cogem ke le
Tînûwêtî da emirê û. înca basî tellekanî siyasetî
Nêwdewlletî ew wextey şax û kêw egirê û "wiçanêk û
Bas egorrim" basî bizey Monalîza û giwêy Fan Kux û
Şorte kurtekey Bîkaso û şêtbûnekey Xalîd Se'î û
"Bazêkî tir" eçûme behrî Îcewe û etasam û min
Her edwam, basî.. basî.. hellatinî direxteknî Kurdistan
Bo henderan, basî şî'rî bêbawik û "egerramewe
Bo diwawe" basî ew xedirey ke Nalî le Mestûrey
Jin şî'rî kird!. Basî êsta û piley germa û
Cibey berî Ehmed Awa û!
Diwa hewallî kobûnewey heftamînî lîjney aştî û
Basî dîwarî pîrerî nimûneyî û!
Basî kiçî lûtbirrraw û! Basî basî basî..

Bellam ewey ke nehate ser em mêze
Wişeyek bû "be hellkurmawî mayewe le naw naxima"
Pepûleyek "ballî cût û nekirayewe"
Pelle hewrê "ke êsta û ewsayîş nebarî"
Min emşew le ser em mêze rûbarê wişem riştuwe
Bellam kaniyekî ‘asî le naw qulay min da ye û
Her hellnequllî!.
Polê ballindem hênaye ser em mêze
Taqe ballindeyek nebê ke her nehat û
Her nehat!.
"Ewe teyrî ew xewne bû
Ke hellnefirrî û her hellnefirrî"
Nayidirkênim
Xoşewîstîy gewre wa ye
Zeryayek e û nehênîy ew le bêdengî û
Le tenyayî û le naw qulayî nax da ye!

Silêmanî
Abî 2001

Mihêdîn Zengene

Jûrekem pirr e le diyarî,
Le gomêkî Zurîxewe
Çaketêkî şînî kallim bo hatuwe û..!
Le temêkî Lendenewe
Kirasêkî xollemêşî û
Le şeqamêkî zeytûnîy Parîsewe
Pantollêk û
Le baxçeyekî Oslowe
Boynbaxêkî gullgullî..
Jûrekem pirr e le diyarî..
Xornişînêkî hawrrêm, vîyennayî.
Qapê şerabî bo nardûm.
Le Moskowe kirrêwe befrêkî dostim,
Cûtê gorewî estûru û..
Ziryanêkî qutbî jûru û
Cûtê destkêş û kilête û..
Şepolêkî Deryay Spîş
Perdaxêkî kirîstallî.
Jûrekem pirr bû le diyarî
Bellam emrro zorîm bexşîn
Wextê le naw baxî lîmo û pirteqallî
Baqûbewe
"Ba"-yekî narincî hat û
Destbexene, le gell xoy da
Pirr be hollekanî şano
Bon û beramey "pirsiyar"-î bo hênam û
'Etirî qijî çîrokêkî kurteballa û
'Etirî gerdinî roman û
'Etirî qellemî Zengene!

Silêmanî
19/4 2000

Kemal Mezher

Hemû hemû beyaniyanê
Ke hêşta hetaw nûsituwe û
Hêşta Dîcle xewallû we û, dar xurmakan
Le naw tem da bawêşk eden
Ew hell'esê.. Le gell newres da hell'esê û
Le jûrî wişey bêdar da
Beramber awêney 'eşqê ra'ewestê
Pencereyek le naw serya ekatewe û
Be espayî dest ebat û
Pirşingî mêjûyek egirê û
Pêy enûsê!.
Hemû hemû beyaniyanê
Ew xemêkî rûnakman e û
Le baxî firmêsk û şî'r û le naw dengman da erriskê
Kizeba ye û hajehaj e û nimey baran e û epirsê.
Gumanêk e û le soraxî yaqûtekanî rastî da
Le sîley hemû dêrrêk da da'egîrsê.
Hemû hemu beyaniyanê
Ebê be ballindey mêjûy nêw zemanê
Ebê be karêzkenî kitêb û be dirextî cê jiwanê.
Le her kiwê bê
Wek mêzerî Şerefxan û
Hewrî ser Pîremegrun û sidarekey Emîn Zekî
Eybînîn û weku "lawik" eybîsîn û
Ewîş êsta le tenyayî jûrekey da
Kurdistanî be derziyek dawe le ser dillî xoy û
Ke çaw enê be birînî kêwanewe
Hellebceyî n û koçrrewî n û
Le her kwê bîn eman bînê!.
Hemû hemû beyaniyanê

Em qellemî kazîweye
Bellgenamey azarêkman maç ekat û
Gullemêxekî jêr berde qaremanê
Le dîrokman ekatewe û
Be rohyewe eynûsênê.
Hemû hemû beyaniyana!.

26/6 1999

Beşî dûwem: Ballinde biçkolekan

Le naw sebetekey da..

Wek kerwêşkê le naw sebeteyekî piçûk da..
Lewê eçime ser ballqonêkî tengeber
Da'enîşim û le naw kursiyekî qull da nuqim ebim
Be dem bîrêkî pertewe
Pertpert weku
Ellqey dûkellî cigerem
Errwanime dûr:
Qubbey gewrey killêseyek
Biwe be şepqey daristan
Pole teyrê eçine ser qeraxî şepqe
Enîşinewe
Le pirrêk da le gell wijey daristan da
Hell'efirrinewe.. ciya ebinewe û
Le diway xulêk.. le qullayî samallêk da
Cût cût yektir egirinewe!
Le naw kursiyekî qull da m
Le naw willatêkî qull da m
Le naw xeyallêkî qull da m
Hemû rojê
Bew serewe
Werris werris le naw sebeteyekî piçûk da m
Wek kerwêşkê tenha serim be derewe
Lem sate da min be tenha her sêberî
Awênekanî raburdû m
Milim nîştote ser singim û.. nîwenaçill
Şî'rêkim be cê hêştuwe û.. xewlêkewtû m!

Silêmanî
3/3 2002

Xom.. ew wextey ballindem!

Ew şimşalley be lêwî "ba"-we eybînin
Ewe endêşey lûlxwardûy ‘eşqî min e
Janêk kunkunî kirduwe û
Le ciyatî min
"Çunke bo xom nazanim şimşall lê bidem"
"Ba" eyzanê û ew eyjenê!.
Ew ballinde narinciyeyîş ke êwaran der’ekewê û
Le xornişîn da eybînin, taq û tenya dêt û eçê û
Be ballekanî enûsê
Ewe ballindey tir nîye
"Çunke ballinde exwênê û hîç nanûsê"
Ewe min im.. Ewe xom im, le wextêk da
Yan "çîrok" ekem be baran
Yan "pexşan" ekem be zerde
Yaxud "şî‘r" be estêre û
Ke şew dahat
Le sertan da dabigîrsê!.

Silêmanî
2/3 2002

Taşeberdê

Taşeberdê
Le gundêkî bêwejin da
Yekem car bû le jiyanya
Wek ew roje be kull bigrî
Wextê exyar be zorî zor
Helliyankend û helliyangirt û
Birdiyan serî
Kanîyekyan
Pê dapoşî!

22/2 2002

Dawa

Jûrêk daway çirayek û..
Çirake daway mêzêk û..
Mêzeke daway defterê û..
Defter daway qellemêk û..
Qellem daway dest û pence û
Penceyîş daway
Azadî kird!

22/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Baweş

Ew baxçeye
Hemû rengêkyan bo hêna
Hemû bonêkyan bo hêna
Hemû tîşkêkyan bo hêna û
Her dillteng bû!
Kenarî û bulbulyan daye û
Kerwêşk û mamizyan daye û
Xoretawyan le ber kird û
Mangeşewyan pêşkeş kird û
Her dillteng bû!..
Ew baxçeye
Wextê dillî kirayewe û
Tenha ew kate pê kenî
Beyanîyek
Dû mindallî kurr û kiçî
Êsiksûkî
Le baweşî xoy da bînî!

22/2 2002

Hellkendin

Lêre û lewê xakman hellkend
Bo aw gerrayn..
Lew deştane û le binarî şaxekan da
Bo nextîne û asewarî
Konman gerrayn..
Le qerax şar xakman hellkend
Bo binaxey mallêkî niwê..
Le naw şar da erzman hellkend
Bo kêbill û bo xetekanî telefon..
Ber le aw û
Ber le asewarî kon û
Ber le mall û pêş telefon..
Le jêr xak da
Kaseser û
Êsk û piruskî têkell û
Cilî bêreng û rizîwî
Azîzekanman doziyewe!

22/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Gêlas

Wextê kuştiyan
Denke gêlasêkî pê bû..
Kewt û denke gêlasekeyîş perrî..
Rakişabû.. Rû le estêran xewtibû!
"Çîroknûsekeyan wa kuşt"
Werz têperrî û zeman royîşt û
Denke gêlas lew şiwêne da
Çeqî û riwa û bû be dirext
Em careyan
Le cêy gella û le cêy gopke û
Le cêy gêlas
Herfî girt û
Wişey girt û
Ristey girt û
Bû be dargêlasî çîrok!

22/2/2002

Ahengêk

Rojî merg û bêdengî bû
Ew direxte
Le kilorî qullî xoy da
Kelleşêrêkî şardewe!.
Ke bêdengî dirzî bird û
Kelleşêr hate derewe.
Kirmî awrîşmî ew keje
Be kirasêkî awrîşmîn
Direxteke yan xellat kird!
Ew rojey xor amade bû.
Le ber dem çepllerrêzanî gella û çill da û
Le naw fîkefîkî "ba" da û
Le gell te'lîqî mirîşk û garegarî û,
Le gell semay rût û qûtî befrawan da..
Wextî zerde
Ballindekan her be denûk
Kirasekeyan hellgirt û
Le serewe
Kirdiyane ber direxteke!

20/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bazney ‘eşiq

Çawerrwanîm bû be gom û
Rojê çûme ser kenarî û
Yek meraqî xirrke berdîm
Tê hawîşt û
Rohim lerzî û
Leşim lerzî û
Wirde wirde bazney ‘eşiq
Gewre bûn û hatine pêşî û
Dewreyan dam
Bazinî destî û milwanke û çawekanî û
Lêwekanî û
Emêstake min bo xoyşim
Bûme xermaney girrêkî ellqebendî û
Dewrankerî koçerî ser
Şarekey yar!

20/2 2002

Diwa dîdar

Bordûman bû
Le sêberî gaberdêk da
Wenewşeyek çawerrê bû
Pepûlekey bigate lay!
Serêkî birde derewe
Ta temaşay gulle se'atê bikat û
Dillniya bê se'at çend e!
Pepûley yar
Le wextî xoy da geyişt û
Bellam sed dax
Wenewşe bo xoy kujra bû!

17/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Tawan

Dengî bulbulêkyan kip kird.
Bellam baxêk zirîkanî!.
Lew baxe da dirextêkyan girr tê berda
Bellam şarê xollemêşî
Tê da barî!.
Lew şareyîş da kiçêkyan kuşt
Ax, ax, ax, ax
Ewsa îtir nîştimanê
Lem perr hetaku ew perrî
Be bulbul û be baxçewe
Be dirext û xollemêş û
Pirse û şar û.. asmanewe
Ta ’erşî Xiwa
Sûr
Sûr
Sûr hellgerra!

15/2 2002

Taqe reng

Rengî şewim le qijim da
Roj sirriyewe!
Rengî beharim le xom da
Wextê payiz hat sirriyewe!
Xoşî rengî xoy piya kirdim û
Na'umêdî hat sirriyewe.
Dillniyayî le rengî xoy hellkêşam û
Keçî tirs hat sirriyewe!
Tenha rengê
Kall nebûwe û
Qet neçûwe
Her rengî xoşewîstît bû!

15/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dinya

Paytextê giwayekî kerr bû
Eger mebestî nebiwaye hîç bibîsê
Ew giwêyey ekirde dinya!.
Mêjûyek çawêkî kwêr bû
Eger mebestî nebiwaye hîç bibînê
Dinyay bew çawe seyr ekird!
Rojê dinya
Zorî bo hat
Le naw giwêçke saxekey da
Çallenewtî teqandewe û
Le naw çawe saxekeşya
Agirekanî kujandewe!

15/2 2002

Qij

Le rojêkî hawîn da bû
Tallekanî qijî kiçê
Bestiyanmewe bew dare we
Ke herdûkman le sêberya danîştbûyn!
Bestiyanmewe û girêyan dam be çille we û
Be liqe we..
Wîstim hestim.. girtbûmyan
Wîşistim tallemû bipisênim
Ew pisanmî û dayname we!
Wextê sêber be cêy hêştîn
Wextê hetaw hate serman
Ke ew hesta û wirdewirde dûrkewtewe
Min ew kate kiramewe
Bellam her zû
Zanîm dîlîm lew qije da
Azadî ye û
"Kiranewe" çollim eka û dam exat û pêwem edat
Zanîm wextê qij emgirê û berim nadat
Min ew wexte îtir firrîn û hellkişan
Berew berzayiyekanî naw ‘eşq û
Şî‘r embat!

14/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çîrokî gurgê

Gurgeke siwarî keştî bû
Keştî kewte ber ziryanî tûrrey aw
Xoy da le şaxî seholl û
Qillp bûwe.
Dû-sa beçke û
Dû pasewanî xinkan û
Bellam bo xoy lew serewe hate derê.
Gurgeke siwarî maşên bû
Le pêçêkî hellemût da..
Gaberdê qoçêkî lê da û
Xilor bûwe û.. dû yawerî û
Şofêrekey merg birdinî û
Bellam bo xoy tenha penceyekî şka û
Le binewe hate derê!
Gurgeke siwarî qîtar bû
Şewêk qîtar le temêk da le rê lay da û
Xoy be tunêlêk da kêşa û
Nîwey sernişîn kujran û bellam bo xoy
Tenha her qaçêkî şka û
Le binewe hate derê!.
Em careyan
Gurgekeman siwarî firrokeyek bûwe û
Le ser û hewrewe efirrê..
Ey firroke wextê bikewête xwarê?!!

14/2 2002

Awêne û payîz

Awêneyekî dûr dûr e le min, ballat,
Şorre jinim!.
Welê şewqdanewey ciwanît, minî payîz,
Le her kwê bim
Be dem rê we eger pertîş bûwe şewqî û
Eger xoy dawe le şax û
Wirdîş bûwe tîşkî û
Zamdar bûwe rengî!
Le akam da
Ebê her ew
Be êwaran
Le gell tîlmaskê xunaw da
Bigate pencerey serim û
Be hêwaşîş le gell tem da
Biçête ser wişey zerdim
Şorre jinim!

Silêmanî
13/2 2002

Leyekneçûn!

Gullcarrê gull be sedan bûn
Bellam hemû le yek reng bûn
Yek çirke çawyan ragirtim!.
Pole melê sedan bûn û
Her le yek awazyan exwênd
Yek çirke sat giwêm lê girtin!.
Polê kiç bûn..
Min yek çeşin ciwanîm bînî
Yek deqîqe seyrim kirdin û
Be cêm hêştin!.
Refeyekî kitêbxane:
De kitêb bûn
De xew bînîn
De cîhan û
De riwanîn û
De lêkneçûn
Çend mangêke le geştêkî rengaûreng da
Birdûyanim û fêryan kirdûm
Ême ew wexte ciwantirîn
Le riwanîn û le firrîn û le reng û boy
Wişekan da, le yek neçîn!

11/2 2002

Wênekêş

Êwareyekî direngwext.
Xornişîn xoy wênekêş bû..
Barîkele û qijî tenk!.
Le ser kursîy hewrêk spî
Piştkomawe.. danîştibû
Keme.. keme
Rengî sûr û rengî zerdî
Le naw defrêkî aso da
Têkell kird û
Tabloyekî pirteqallîy siryaliyaney
Lê dirust kird:
"Firîşteyek le naw girrêk da esûtê û
Marêk le memkî allawe û
Dozexewan rawestawe û
Kollewijî lolaqêkî be destewe û
Pê ekenê!"
Xorinşînî wênekêşî şipirzey naw
Rengî ciyaciya
Tabloy hellgirt day be şanya
Ta wek diyarî
Bîba bo kiçe estêrey gerdûnî dûr!
Hêşta ew her be rê we bû
Le deştî hewr eperriyewe
Le pirr tarîkî rêjiney baranêkî darrjan û
Tablo xusayewe rengî û
Wênekêşîş le meraq da..
Lew dîw şaxekan awa bû!

10/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Newres

Giwarekanî
Le şêwey dû newres da bûn!
Çirpeyekim be giwê da kird!
Nukteyek bû
Rût û qût û
Pirr le haje û
Pirr le şepolî pêkenîn.
Le gell qellbezey qaqay da
Newresekan kewtine cûlle û
Ballyan girt û kenar gerdinyan cê hêşt û
Be serman da
Kewtine firrîn!

10/2 2002

Kiç

Lew deşte da
Min kiçêkî kirasspîm
Le ber mangeşew da bînî
Bînîm xerîk e be destêk
Gullemêlaqe eçinê û
Be destêkîş.. lew deşte da
Çetirî estêran hell'eda!.
Awim bînî
Le dollêk da taq û tenya rawestawe û
Le ber demî tirîfe da hepesawe!.
Darim bînî ser kewtûte ser girdêk û
Lewê we ra
Le dûre agirê ramawe!.
Askim bînî
Sill le sêberî hewrekan ekatewe û
Befrim bînî
Le taw'eşqekey hellekok
Tinok tinok tiwawetewe.
Mang ciwan û deşt ciwan û gullemêlaqe û estêran,
Aw û ask, dirext ciwan û
Bellam le hemûyan ciwantir
Kiçeke bû!

10/2 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bîrneçûnewe

Zemanê wişe kuştin bû
Bellam hemû wişeyek na!
Zemanê ‘eşiq kuştin bû
Bellam hemû ‘eşqêkîş na!
Serbazekan
Segêkî polîsî reşyan legell da bû
Le sîley yekem şeqam da
Ke ewyan dî
Bangiyan kird û
Segekeyan berella kird!
Ewîş le cêy xoy da çeqî!
Serbazekan
Wek baznê dewreyan da
Segekeyîş piyay da hellgerra û
Qullanc.. qulanc
Kewte bonkirdinî leşî.
Serbazekan
Zor demêk bû
Segekeyan le ser bonkirdinî şî‘rî yaxî û
Le ser bonkirdinî ’eşqî xak û
Nehêniyekanî azadî û
Bonkirdinî rengî hellwêst.. meşiq dabû!
Çend deqîqe
Segeke her bonî kird û
Le pirrêkda qurskeyekî bo kirdu û
Wazî hêna û gerrayewe
Bo berdemî serbazekan.
Şa’îrekeyîş, dîsanewe
Be herdû dest killawekey
Tund girtewe û

Be rêgey bêweyî xoy da
Roy têperrî!.
Şa'îreke hîçî le wane pê nebû
Ke le rojgarî kuştinî peyvekan û manakan da
Bo serbaz û segî polîsî bella bin!
Ke le rojgarî kuştinî 'eşqekan û xak û xoll da
Bo dîrokî şewezeng û jûrî azar çil çira bin!.
Ewey ke ew le gîrfan û baxellya bû
Qesîdeyekî serkiz û penagîr û
Jawejawî zimanêkî naw kûleke û
Formî 'eşqêkî betall bû!

Silîmanî
10/2 2002

Heştem roj

Le heştem rojî mangêk da..
Heştêkî sard, rojêkî sard. ew mange mird!
Le heştem rojî mangêk da..
Le rojêkî sard û sûr da
Rojîş weku kurrekan û kiçekan û
Newresekan ewîş kujra!
Le heştem rojî mangêk da
Qajûyekî ballberînî reş û gewre
Kewte asmanî ew şare. Qîrrey sard û,
Sêberî sard. Nisêy mêjû, çokyan dada û
Şar pêçraye naw tirsêkî tengeber û
Şar xizaye dûkellewe û
Henasekan killom kiran!
Le heştem rojî mangêk da
Heştêkî sard. heştêkî şûm
Rojekan wek kifnî zerd û
Şeqamekan bûn be tabût!.
Le heştem rojî mangêk da..
Heştî şubat!, heştêkî dirr, carêkî şûm..
Dîrokê bûwe qurbanî û
Zistanêkîş be bêwejin!

Heştî şubatî 2002

Behane!

Ger biyanûyek nedozimewe
Min natwanim biçime layan!
Axir min çon le xomewe û herwa bê pirs
Etwanim dest kem be sîney ew "mang"-e da
Ger pêy nellêm: Lêm bibûre
Min diwênê şew a lêre da
Şî'rêkim lê be cê mawe û boy egerrêm!.
Min natwanim herwa bê pirs le xomewe
Be pilîkaney naw "ba" da ser bikewim û
Biçime naw mallî "zuhre" we
Eger nellêm: Lêm bibûre
Heftey royîştû
Lem malle da, min gillolleyek xeyall û
Hendê tîşkim lê cê mawe û boy egerrêm!
Axir min çon le xomewe
Biçime naw jûrî nustinî "xezall"-e we
Eger nellêm: Lêm bibûre
Lem jûreda û
Lêre da min xewêkî çawşînî ciwanim
Lê kewtûwe û boy egerrêm!
Min nayştiwanim le xomewew herwa bê pirs
Maçim be leşta hellzinê û
Bême naw qijî pirrtewe
Eger nellêm.. Lêm bibûre
Ber le tozêk her ke dîmît
Siwêskey dillim
Le singmewe firtey kird û
Çûwe derê û çawim lê bû
Xoy kird be baxekey to da
Lêm bibûre min naçarim boy bigerrêm

Min ezanim le hîç şiwênêkî tir nîye û
Le lay to ye û
Le qijtewe ta qulepê
Boy egerrêm

16/1 2002

Hemîşe ‘eşiq!

To melêk î le perrey gull.
Ciwanîy asot û
Firrînit pirr e le ‘etr û
Gimet pirr e le şewnim û
Min dirextêk im le xeyall
Pel û pom le tirîfe ye û
Gellakanim le serinc û
Amêzim pirr e le şî‘r!
Ey gull kotir!
Were le ser çawerrwanîm binîşewe
Ba ciwanî û xeyall lêk bideyn
Wişe çexmaxe batewe û
Bon bibarê û reng bibarê û
Hemû diniyayîş bimanbînin
Lem şare da
Çon têkellî yektir ebin
Dû awanî be xurremî
‘Eşq û şî‘r

Silêmanî
5/1 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Namey rûbarê

"Legell xoşewîstîma bo Se'dî Yusif"

Awî Dîcle
Ba taryîkîş be herdû mişt
Bîxwatewe û
Ba ablluqeyîş setlil setlil
Hellîhêncê û ba deştî xwêş
Hellîmjiê..
Awî Dîcle
Ba kemîş ka wek dillopî pêkenînî
Ser rûmetî lîmoy Besre û
Xemgînîş bê çon dem û çawî
Ciwad û
Nanî birsî û
Meqamekanî Gubançî û
Çîrokekanî Tikerkî..
Awî Dîcle
Ba kefî xoy sîxurrî bê û
Xeber bida le newres û
Qullap hellda
Bo girtinî sûremasîy dillî Bexda û
Şî'rî Se'dî..
Awî Dîcle
Ba şipirze û ba mandûyîş bê
Çon namekanî Seyab û
"şinaşîl"-î çawerrwan û
Gîrfanekanî "merdan" û
Killawekey Cewahîrî..
Bellam ewsayîş.. awî Dîcle
Hêşta beşî

Ew tifaney pê emênê
Le naw demya koy katewe û
Le kemerî birîndarî Kerxewe bê
Yan Resafe
Serî qurrawî derbênê û
Çaw hellbirrê û
Hemû rojê
Bo şa'îrêkî polîs û
Bo polîsêkî şa'îrî bihawêjê!.
Awî Dîcle her ewendey pê emênê
Awî Dîcle!.

Silêmanî
11/11 2001

Dû razî romansiyane

— 1 —
Em rojane..
Min romanêk exwênimewe
Riste.. riste
Wirde estêre le "serma" to ekat û
Le xeyallma.. aso.. aso
"Ba" reng eka û
Telîsmêk e
Minî kirdûwe be hewzî hepesawî
Berdem mang û
Be direxti sersurrmawî
Roxî zayekî zistan e!
Em romane..
Tenha roman e hez nakem
Bîdem be kes!.
Tenha roman e hez ekem
Ke xwêndinewey diwayî neye!
Em romane
Tîrajekey dû dane ye û
Keçî hezaran eybînê û
Keçî şarê pêy sersam e!
Nûserî roman Xuda ye û
Nawekeyşî:
"Sîhrî dû çawî Leyla ye!"

— 2 —
Min dûrgem û ewîş zerya
Mercî ew ‘eşqe weha bû
Hemû şewê
Le kenar da

Honrawey bo bixwênmewe
Heta enwê!
Mercî ew ’eşqe weha bû
Egîna xerqim ekat û
Be şepolan dam’epoşê!
Diwê şew min ew mercem şkan
Çunke zanîm xem bo ’eşqê
Le nuqimbûnî tewaw da
Ciwantirîn şî‘r enûsê!

Silêmanî
19/8 2001

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Hawser!

Êste zo rcar.. nîweşewê
Şî‘r riqî tenyayîm û jûrekem û
Qellemekem.. hell’esênê û
Xeyallim tûrre ekat û
Le min ebê be reşeba û
Ber le geyîn.. emwerênê!
Em hawsere hulhulîye..
Le pirrêk da şewêk "cê" ciya ekatewe û
Be cêm dêllê û le jûrêkî tir da enwê!
"Wextê ke min derbendêkî pirr le girr im!"
Her em hawsere rarra ye..
Şewêkî dî, ew lirfe ye û, xoy baweşim piya ekat û
Dêtewe lam
"Ew wextey min perrey spî û
Şimşallêkî sard û sirr im!"
Em hawsere hulhulîye le min nagat!
Ger wa birrwa min naçarim
Em zistane
Jine çîrokêkî ciwanî.. kellegetî
Le wêney Ana Karnînay
Be ser bênim!!.

22/8 2001

Eşqî to hetaw e!

Çawanit hemîşe dû kanî n
Le xewma.
Her boye beyaniyan
Ew wextey ke şî'rim hell'esê
Seyr ekem:
Cêgekem pirr bûwe
Le gullî
Ewînit û
Le nimey gijûgiya!
'Eşqî to hetaw e
Ew wextey le rohma helldêt û
Etbînim.
Wextêkîş ke erroy natbînim
Ebîte sêberî cestem û
Hewrêkî xeyallim û
Pê be pê
Rê ekey legellma!

Silêmanî
15/6 2000

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ramûsan

Şewî mangeşew e leşit
Tenyayî minîş rêbwarî.
Çi ewînêkî zîwîne
Lem seferî gull û wişe û barane da
Hellkirdinî barrêzekey arezût û
Darrijanî maçekanit!.
Xemit germ e û
Tenyayîm sard.
Le ramûsanî ebedîy em 'eşqe da
Ke lêk edeyn
Hewar.. hewar
Da'egîrsê azarman û
Herdû ebîn
Be yek şî'rî billêsedar!.

Silêmanî
10/6 2000

Beşî sêyem: Pêdeştî pexşan

Reşebayekî çemûş û beyanîyekî taze

Beyanîyekî taze bû
Bo yekem car bew core bîrim nekirdewe
Wek reşeba eywîst:
"Xollkirdine çawî aw: ta kwêrkirdinî.
Estowirdkirdinî darûbar, hêlaneruxan,
Wird û xaşkirdinî awênekan û feramoşkirdinî
Bêşke û gizing û be aşkirayîş kuştinî
Hewr û kêllgekan!"
Bew core bîrim nekirdewe
Wek reşeba eywîst.
Le nêwan min û ew da:
Bêdengîyek dirust bû
Bêdengîyek le berd.
Bêdengîyek le textey tabût.
Ewe 'umrêkî dirêj e, ewetey şax le bîrêtî,
Reşebayekî kore û çemûş û rîşin. lem şare da
Padşaye. Padşayek pirr e le zemherîr û pirr e
Le mar û le şehwet û pirrîş e le wîqar û we'z û
Tegbîr. Padşayek rojî çend car le billêsey
Dozexman hell'ekêşê û yek hîkateman bo eka û
Yek sewllecanman nîşan eda û yek rûgey peristin û
Yek textî şanişîn!
'Umrêkî dirêj e renge cudakan mirdûn.
'Umrêkî dirêj e aw her yek defrî heye û
'Umrêk e ballindekan her yek cor firrîn û
Yek cor asman û
Yek cor xwêndin.
'Umrêk e.. 'umrêkî dirêj dirêj
Şimşêrî wişey xeza le ser gerdin
Sema eka û hell'eperrê pencey qirtaw

Le nawman da nîştecê ye û
Le gellman da enwê mirdin!
Em beyaniye bew core nemriwaniye xom
Wek reşeba eywîst.
Ew xomî le naw xom da xanewêran û sergerdan kird.
Bellam min bo xoyşim teyrê bûm gul.
Min xom esp bûm û bellam hîlem xesîw.
Min xom dirext bûm û bellam rîşem rizîw.
'Umrêk e renge cudakan mirdûn.
'Umrêk e min berdî bin gom û
'Umrêk e min xew nabînim û
Birînêkim zebûn!
Min em beyanîye ciyabûnewey dengî xom
Le givegivî ew, rengî xom le şêwey ew
Serî xom le serî ew ciya kirdewe.
Ezanim min îtir lem beyanîyewe
Rêbiwarî naw memleketî qeder ebim
Ezanim min îtir be şiwênmewe eba agir
Diwam ekewê se'îr û zemherîr û
Rêm pê egirê bahozî lim û
Le ser lewhey wicûdim enûsrê
"Bî'sel mesîr"
Ezanim û ezanim le şiwêne berzekanî şarewe
Rojî çend car be pişkokan recim ekrêm û
Rojî çend car sege reşekanî Heccacim
Tê ber eden û renge bimxene gunyeyekî
Serdaxrawe û rewaney Necdim biken û
Awarey tekfîr. Çunke witim:
Çend rengê bo em dinyaye.
Çunke witim çend xorî bo em zeryaye
Çunke carrim le spîyek da ke her
Riwallet bû. Çunke witim ewe
'Umrêkî dirêj e min dîlî naw rengî xomim!
Min le goşey ew tabûtey tiya bûm
Hatime derê û zirîkanim.
Em beyanîye rojibaşim le tirs nekird.
Weku caran min em beyanîye rojibaşim

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le reşeba û mirdin nekird.
Wêram le gell xom da bidwêm
Wêram îtir pirsiyar bikem
Wêram îtir guman bikem
Wêram rûnakîy qaçax û tîrêjî qaçax bidwênim.
Le gell şemall û pepûle da piyase bikem
Le gell hemû ciwaniyekan da şî‘r bixwênimewe..
Wêram estêre bijmêrim û
Guman le xwakaniyan bikem.
Serî xom be rûnî
Le zor awêne da bibînim!.
Bellam em werçerxanem cestem
Edate dest nadiyar. Reng e lûlim biden û
Le şewêkmewe bipêçin û bimfirrênin. Reng e
Hemû xewnekanim le ber demî xom da bişkênin û
Wirde şûşey ew xewaneyîş bikene kalaney
Çawmewe. Reng e herdû gilêneyşim bixene qulî mişti reşebawe.
Em beyanîye şitêk rûy da
Le rûdanî beryekkewtinî dû estêre eçû
Le rûdanî ciyabûnewey goy ser zemîn le
Piştêney hesarekey. Min êsta le fezayek da
Exulêmewe xollemêşî û pirr e le dest û pencey
Babirdû le rengî babirdûy ewaney
Birrwayan be yek reng nebû. Le fezayek dam
Pirr e le zirîke û sîxnaxe le qirîşke û le sûtanî
Berdewam. pirr e le heqîqete awarekan.
Min lêre û lem hesareye da hemû ew ruxsaranem
Bîniyewe ke le hezaran sallî rojjimêrî cengellewe,
Rojjimêrî bit û bitewanewe, derbeder kirabûn.
Baranî derbeder, hetawî sergerdan, ’eşqî
Nakam. Hendêkyanim nasiyewe û ewanî tir ne û
Çi xewêkî seyr bû
Xewêk bû. xerîk bû, wek befrî
Ber reşeba şêt bim.
Xerîk bû wek limî kenar zerya
Mil bidem û bêdeng bim.
Bellam xew bû.

"Kê mirdinî xoy ret bikatewe û
Yexey qederî xoy bigrê û
Le ber demî yekrengî da danemênê
Jiyan ebatewe"
Eme pendî xwawendêkî girîkî ye
Ke razî nebû peristin bika be pîşe û
Razî nebû be tenha rastîyek bixwênêtewe!
Her diwênê bû hawrêyekim reşeba kirdî
Be pasewanî gorristanekanî xoy. Reşeba kirdî
Be zêwanî ew gumezaney ke baw û bapîr û piştî
Pêşîney reşebayan tê da nêjiraw.
Hawrêkem êste bûwe be qelereşkeyek,
Be qajûyek û le ser darêkî zirrî ew
Gorristanane qîrrey dê û exwênê.
Qajûy reşeba ye
Qajûy mirdokan e û
Çawhellkollî zîndokan.
Em beyanîye ‘umrî xom kurt kirdewe, ewendem
Kurt kirdewe her tallemûyek nêwanî ew û merg e.
Çunke em beyanîye dirêjem be ‘umrî "a" neda.
Çunke lew rîzane ciyabûmewe ke tabûtçêkerî
Reşeban. Ewaney rûbaryan be tumetî zîna
Kuşt. Destekanî dirextiyan be tumetî dizî
Birriyewe û, le ser maçêkî sewz, celldeyan
Le kiçe darsêwekan da û, kurrekanîşiyan le ser
Qumê bade xakesar kird.
Em beyanîye ke hatime derewe
Bo yekem car baran diwandimî û pêy witim:
Ewe îtir her çawî xot nîye
Bote çawî kanîyekanîş.
Bote çawî rêgakanîş.
Ewe îtir her destî xot nîye pêtewe
Bûnete dest û pencey darekanîş.
Îtir ewe her serî xot nîye be xotewe
Bote serî mindallan û kiçekanîş.
Bote serî kêwekanîş.
Çend hengawê lew lay baranewe

Derozekerêk pêy witim:
Reng e îtir bo le mewdiwa
Be yekewe cîhan tey keyn!
To bo rûnakî û
Min bo nan!
Lew beyanîye tazeye da..
Ke yekem şeqam bînîmî ewîş pêy witim:
Pê eçê le ser singim xaçêkit bo dakutin û
Her le ser singîşim xollemêşeket be ba biden û
Pê eçê temenit le temenî gull kurttir û
Bo diwa carîş gewallehewrêkî behare
Le rêjineyekî xêra da lawandinewet bigrête esto
"Temenî gull çend kemîş bê
Bonêkî xoşî be xoşewîstî bexşîwe"
Le ber ewe ne dilltengim û ne dirrdongim
Ezanim min ew sêberey diwênê nîm
Lew beyanîye tazeye da ewey sersamî kirdim
Jinêkî sertapasûrî gerrekekeman bû, nazanim
Çon giwêy lem çirpeçirpey naw min bû.
Çon giwêy le dengî xewnekanim bû. Nazanim le
Pirr hate ber demim û hemû leşî be gullî jalle
Dapoşrabû. ebirîqayewe. Jinêkî selar,
Jinêkî gulalleyî, çawî tîj. le naw qutuyekî
Daxiraw da. kilafeyek qijî pêşkeş kirdim û
Witî: Ewe reşebaket hellîkend. Ewe
Destî ew deskeney kird. Eme diwa yadgarî
"Ciwan"-e ba lay to bê bo ewey be tîrî
'Eşqî giriftar bî. Ba lat bê bo ewey her tallêkî
Kuştargeyekit bîr bixatewe. Ba şewane her talle û
Hîkayetêkî namoyî xoyit bo bigêrrêtewe înca binûyt.
Min kemêk giryam.
Bellam ew zorim pê pêkenî!
Jineke witiyewe:
Bellam herkes ew qijey la bê
Heramî la ye.. heram.. heram
Min îtir ew tallemûwanem, ew qijem,
Le serî xom da riwanewe!

Êste xew le bêdarî da ebînim
Çawekanim kirawen û xewîş ebînim
Herwek gomêk çawî zeq û xewîş bibînê
Herwek agirêk bisûtêt û xewîş bibînê.
Min beyanîyekî tazem le çawda ye
Hawriyekem bûwe be qelerreşke
Bîrî ekem û xefetîşî bo exom
Min birrwa nakem carêkî dî ew hergîz bigerrêtewe nawman.
Bigerrêtewe naw xewnekanman û
Naw xoşewîstîman û
Naw awênekanman û naw baxçekanman!
Em beyanîye
Bûmelerzeyek rûy da
Le pêş da minî jêreûzeber kird
Minî helltekand û minî text kird
Bûmelerzeyek le pêwanekanî Rîxter serûtir.
Le naw min da ew şare xapûr bû ke tiyay da le dayik bûm.
Ew şeqam û gorrepan û diruşm û holl û şanoyane
Neman ke minyan le çiwarçêwey xoyan girtibû. Ne'
Ew şare nema ke minî tê da le dayik bûm.
Min le jêr bûmelerzewe gerrawmetewe.
Min le henawî bûmelerzewe hatûmetewe.
Le dirustbûnewey estêreyekî taze da
Le dayik bûmewe.
Derewey xom
Hêşta wirr û kas û sersamin û têm nagen.
Ewan hêşta her giwê le dengdanewey
Dengî biyaban û seday xezakan û xelîfey
Lim û çollewanî egirin. Ewan hêşta her
'Ebdî peyve bebirîq û baqekanî ew zimane
Le riwallet ziyatirî nexwêndûtewe. Ew
Peyvaney tirsiyan le nûkî rim û peykanî
Rimekan da hêna û le bêşke û gizingewe çawtirsênî
Pirsiyarekaniyan kird û gumaniyan her le naw ser da
Kuşt.
Min em beyanîye
Lem beyanîye tazeyewe

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Lem hesare tazeyewe
Ballindekan minyan kirdûtewe be hêlane
Pirsiyarekan minyan kirdûtewe be mirov.
Rûbarekan minyan kirdûtewe be awerro.
Qelerreşkekey hawrrêm
Carêkî dî nayetewe nawman.
Min êsta aw hawrrêm e.
Perresêlkeyek hawdem û
Baxçeyek hawserim e
Ke hemû rengêkî lê ezê.
Heyf bo hawriyekem. heyf bo reşbûnewey!
Êsta xoşewîstî min û em şare
Le lêburdin û guncandinewe
Serçawe egirê. Lem şare da
Êsta her rîşêk berêkî nebê û berêk nedat
Exrêne tenekey xollewe.
Xoşewîstî nagiwêzrêtewe û hawirde nakrê.
Hezar rengî heqxwazî hen
Hezar bonî niwêxwazî hen û
Ne rengêk serdarî hetahetayî û
Ne dengêk peyvî hetahetayî!.
Reşebakanîş lêre bin yan le her şiwênê
Naçar in. naçar. diway ew bûmelerzeye
Yan ebê ser kiz ken. yan xaw binewe û
Le ber demî nasiktirîn gull da
Binûşitênewe!
Lem satewexte da û le defterekem da
”Ba”-yekî şînî hêwaş hellîkirdûwe.
Seranserî bûnim. seranserî xeyallim
Le deştêkî keskî rakişaw eçin. rakişaw
Le ber demî rîze çiyayekî bilûrîn da.
Sertaserî em “ba”-şîne pepûle
Dewrî girtûwe. Min êsta çawim lê ye wişekan
Yek le diway yek etirukên û ebin be zine yan
Wenewşe le defterma. Eme kernevallî
Hemû rastiyekan e. kernevallî hemû xewnekan û
Şarekan e. Em kernevalley emrro, le yadî

Tîrorkirdinî qesîdeyek da rêkxirawe ke le beyanîyekî
Dûrî wek emrro da.
Reşeba rîşekêşî kird.
Qesîdeyek ke le beyanîyekî dûrî wek emrro da
Xerîkî ewe bû be ser qelay Hewlêr da hellgerrê û
Peyamî bûmelerzeyek rabigeyenê, lew beyanîye da,
Le pişтewe pê kiraw qesîde xilltanî manay xoy bû
Xilltanî xeyallî û xilltanî xwênî wişe bû.
Em kernevalle le yadî hawarêk da ye
Ke hêşta seretay şeqjinî bû, ew hawarey,
Ke le yekem kolanî tarîkî ew qelaye da kujra!
Em kernevalle be yadî hemû ew rengane ye ke le ber
Cudayî reng tefr û tuna kiran. Em beyanîye
Lem kernevalle da qijî hemû qurbanîyekanman
Kirdûwe be pencerey jûrekanmanewe.
Qijekan dagîrsawin.
Qijekan le pall lawlaw da errwênewe!
Her bo ewey berdewam serî ewan
Le nax da bicirîwênin û bîr neçinewe.
Em kernevallî xogorrîn e
Bew demamkanewe yad ekrênewe
Ke nîşaney peyman taze kirdinewen
Le nêwan em beyaniye û hemû mirovekan û
Hemû ajellekan û hemû ballindekan da.
Demamkekey le serim hellkêşawe
Serî askêk e
Ke rojê le rojan lew pêdeşte ciwanane da
Awêne bûn bo ‘eşq û
Her le ber ‘eşqîş ser birran!
Kernavallî demamke
Em demamkeyşîyan.. ser û ruxsarî ew kiçeye
Ew herameye.. be ser heramêk da bazî da û
Le diwayî da hellallêkî rîşdirêj girtî û le pena
Dîwarî mizgewtêk da bê binî kird! Eme bo yadî
Ew heram û hellalle ye.. kernevall exayênê û
Şew dadêt!
Le şew da be beyanîyekanî xom da eçimewe! Min şewim

Ewende xoş ewê ta emdate dest estêre
Mêyekan û le gelliyan da azadane cût ebim! Le şew da
Be xewşekanî rûnakî da eçimewe. Hendêkiyan le
Defterekem da esirrmewe hendêkiyan bo pend û
'Îbret ehêllmewe, bo ewey şayetî se'atekanî
Raburdûm bin. Le şew da perdeyek le nêwan min û
Gerdûn û Xuda û hemû 'eşqekan da namênê. Serbestane
Xom ekem be mallî hemû heram û hellallêk da. Netirsane
Le ber dem hemû ew pirsiyarane da ewestim ke reng e her
Le zarî beyanîye xesawekanî xomewe, beyanîyekanî caranim.
Şermezarim biken, bellam ewestim bo ewey ciwantir le
Hemû rastîye ciyaciyakan wird bimewe. Bo bitirsim! Le katêk da
Min hêşta tiwanay ewem hebê şitêk bigorrim.. şitêk
Eger ewendey mêrûleyekîş piçkole bêt. Xo min nebûm
Be qelebaçke û zêwanî hîç reşebayek û hîç tarmayî û
Hîç xwawendêkî deselat.. Bo bitirsim! Le wextêk da
Ke min bizanim paşerroj le gell em yaxîbûney min da ye ke
Bizanim ne hellqullînim wişk eka û ne bûmete bitewan û
Ne hîç kam lew reşeba û bitane eperistim!
Bînayîm le azarekanî xom da rûn bûwewe.
Bînayîm dû ballindey ezmûnî leşim in.
Kernevallî demamke.
Demamkekey dem û çawim
Serî tewarêk e..
Ke rojê le rojan le asman da
Mêyekî beşko bû. jine ballindeyek bû
Bellam be gerdinî minareyekewe faqeyan bo dana û
Girtiyan û le cejinî qurban da seryan birrî.
Ême be yadî ew 'eşqanewe
Mîwandarîman lem kernevalle kirdûwe û
Ême be yadî ew tewarewe
Wa xerîk în firrînêkî taze efirrîn..

24/2 2002

Rojî jin.. rojî gulleberrojekan!

Min emrro le tewqeserî em yade da
Le tewqeserî be giya û gull û
Be pepûle tenrawî em cejne da
Momî xoşewîstiyekî nazdar
Nazdartir le kiçe piçkolanekem û
Nazdartir le yadgarî
Mêxekbendekey daye xanim..
Da'egîrsênim!
Momêk be qed bejnî daykim!
Ewendey rohî ewîş spî û bêgerd.
Ewendey şewqî peyv û qisexoşekanîşî geş!
Momêk le şî'ra da'egîrsênim..
Momêk le zimanî kurdî da..
Momêk le 'eşqa û.
Momêk le xemekantan da..
Min em rojem
Be qed kîjolleyekî ciwankîley xwêngerm û
Bellam çawxemgînî gerrekî Rehîmaway
Kerkuk û ewendey jine nankerêkî dest û pil
Biloq kirdûy gerrekî xanûwe qurrekanî
Êreyîş xoş ewê!
Êwe nazanin min em rojem çende xoş ewê?!
Nazanin le çawerrwanî ew da..
Çon wek gullxenderan etirîqêmewe û
Ke hat weku lawlaw têy e'allêm û
Çon gullenazenînêkî
Berdem şinebay kosarê sema ekem û
Çon dillopekanî şewnimîş
Le sîne û berokiya etwêmewe!
Min em yadem kirdûwe be gulleberrojeyekî gewre û

Gulleberrojeyîş le gell çawekanî ew da esurrêtewe!
Min em yade egirmewe.. eykem be xene û
Le dest û pil û qaç û qulî heştî martî edem û
Eykem be tirîfe û le awî tirîfey exomewe!
Emrro min nawim
Şêrko Şefîqe ye!!
Tika ye ba lem yade da gull û wişe û
Bazin û mustîle û gerdanekanî jinan
Her bew nawewe bangim biken û le defterî
Xoşewîstî xoşyan da her bew nawewe
Bimxwêninewe û bimnûsinewe.
Em roje daykim e..
Be kollwaneyekî mor û
Sirkeyiyekî gullgullî û
Lagîreyekî kemê şorrewe!.
Em roje daykim e..
Be qisey danar danarî û
Daykim e be areqey şîn û morî rencewe û
Daykim e be gulle hêroyekî naw egirîcewe û
Daykim e wextê heşt car heşt çira
Lem şew da da'egîrsênê û
Heşt yaqut eda
Le qijî heşt goranî û
Heşt kerretîş
Le ser laperre keskekanî pêdeştê
Be qellemî tirîfe û yan be çuklley gizing
Nawî pîrozî "jin" enûsê!.
Ba em roje pirçdirêj û milkelle
Bikeyn be rojî şare pirrîşkî pirsiyar û
Eşkencey jin û hawarî jin û heqî jin û
Dengî jinî tiya burujênîn!
Ba şare pirrîşkî pirsiyar be her çiwar la da
Pizîzkekanî kellewişe bihawê
Lê negerrê.. Zullim her wa sana danîşê
Lê negerrê.. Qirîşkey ceste xaw bêtewe
Lê negerrê.. Piyawî hozî tolle û fetwa..
Bew xwêney le ber

Dargêlasekanî leşî jin errwa
Desniwêj hellgirê û
Pirsiyar û pirsiyar û pirsiyar
Le terazûwe lasengekey dadga
Laseng be yek le ser sê û
Laseng be yek simêll û çiwar jin û
Pirsiyar.. le birrbendekanî yasa
Le tezbîhî denikgewrey
Birîqedarî alla û le xencerî ber qed..
Pirsiyar pirsiyar.. lew deqaney
Ke şîşî pencerekanî zîndanî
Giyan û cestey jinyan lê dirust kirawe
Pirsiyar lew qanunîye asengeraney
Birrgeyan kirdûwe be kot û
Molletyan dawe be mirdin
Molletyan dawe be kuştin
Hemû asmanyan dawe be piyaw û
Hemû zemîniyan dawe be piyaw û
Tenha kulaneyek be jin!
Min emrro ser le niwê
Çirke û deqîqe û se'atî em roje
Le derbendekey Ranîye da hell'eşêlimewe.
Lem hewîre niwêye.. lem hewîrî azadîye
Gewretirîn nanî xoşewîstî.. bo jin lê dirust ekem.
Le agirî ew azaraneyîş da eybirjênim..
Ke salleha ye ceste û rohî jinî tiya esûtê..
Salleha û salleha ye..
Qirçeqirç û qirçeqirç..
Reng û deng û hest û nest û
Çirpe û 'eşq û pêkenîn û
Pepûlekanî ewîn û
Kotirekanî sîney ewanî tiya hell'eqirçê..
Lem hewîrî rûnakîye..
Lem hellşêlanewey mêjûwe
Lem rûbarî mangeşewe
Gullejin dirust ekem..
Le ser bonî dizrawî raperrê

Direxteji exulqênim..
Le ser melî kujrawî raperrê
Qellemejin dirust ekem..
Le ser wişey dîlkirawî raperrê
Ziryanejinîş exulqênim..
Le ser hetawî dizrawî û
Le ser baranî dizrawî û
Le ser wicûdî diziawî
Raperrê
Emrro bonî heq lem roje dêt.
Emrro bonî dilldaran û bonî şî'rî wenewşeyî û
Bonî mamiz lem roje dêt.
Bonî gillesûrî diway wirdebaran.. lem roje dêt.
Bonî simill û bonî reşerrêhane û
Bonî azadî lem roje dêt!
Min em rojem le awêney bîrewerî da
Kirdûwe be wirşe û pirşey gull'estêreyek û
Le ber çawim bizir nabê.
Herwekû çon herdû sinewberim
Le pêş çaw win nabê..
Sinewberî baxçe û şeqam û kejekanman û
Înca ew jine sinewbereyîş
Ke le zemanêkî bêreng da
Qeladizêy all hellgerran!
Ez lem roje da her şî're mêyînekan exwênimewe.
Her renge mêyînekanîş epoşim.
Be qellemêkî nasikî mêyîneyîş enûsim.
Min emrro hewill edim biçime naw qullayî
Azare mêyînekanewe. Le gell zerdey xornişînî
Xemekanyan da bidwêm. Hewill edem biçime naw
Sate janî mindallbûnî jinekemewe.
Hewill edem şanonameyekim
Bikem be bêwejinêkî enfal.
Be jine hellebceyîyekî rojî 16/3
Be qîjey daykêkî xêllî Heme.
Hewill edem bigeme
Ew perrî dinyay jinan û

Le Emerîkay Latînewe bo Efirîqa,
Firmêskekanî ewan ko bikemewe û
Deryaçeyek
Pexşanyan lê dirust bikem!.
Hewill edem zirîkekanyan bikeme
Peykerêkî berceste û
Le naw jûrekem da daybinêm.
Hewill edem memleketê bixullqênim
Le jine şawe ta geda le xoyan bê!.
Min emrro beyanî ke le xew hestam
Yekem car
Çûme naw baxçe mêyekemewe..
Yekem car rojbaşim le bulbulêkî mê kird
Le diwayîş da min bom xwênd û
Ew giwêy girt!
Min lem roje da hemû kîjolle biçkolekan ko ekemewe
Bo ewey waneyekyan pê billêmewe
Waney xwênlêçorrawî
Ew zullmaney le regezekeyan kirawe..
Waney ew sêwe lasuraney
Le demêkewe nîweyan xurawe.
Waney ew teyraney asmanyan lê qedexe kirawe.
Waney zullim..
Zullmî piyawe berdînekan.
Yasa asinînekan,
Zullmî mêjûy çeqo..
Mêjûy cellde
Basî dembestin û rengkuştin û
Be dirêjîş basî bendîxaney ceste û
Eqllekanî xellûzan û şewezengî peçe û
Le diwayîş da basî eqllî
Çiraxanî Qasim Emîn û Bêkes û Îbrahîm Ehmed û
Be dirêjîş basî
Leyla Zanayan bo ekem!.
Ew kîjolane fêr ekem
Hetaw bixwêninewe hetaw
Wextê hetaw ebê

Be re nigî azadî.. hetaw
Wextê ebê be Encêla û be Marya û
Wextê ebî be beyanî bo hellfirrîn.
Fêryan ekem çîtir be cê pêy
Tarmayî û erjengekanî nerît û
Xencerekanî tolle da hergîz nerron.
Fêryan ekem le tewar biçin.
Le sirûde ciwanekan û
Le şî'rî yaxî biçin.
Min emrro 8/3 pêşangeyek le gelerî
Dillma ekemewe. pêşangayekî taybet bew
Wêne fotografiye reş û spîyaney mên.
Be porterîtî komellê lew jine rêçke şkênaney
Ke zemanî piyawyan lerzand û
Dîwarî bêdengîyan ruxand û
Ser û pirçyan dagîrsan û
Bûne meşxellî rêge û ban.
Pêşangeyek le gelerî dillma
Pêşangayekî gerrok
Pêşangeyekî bê rîş û simêll.
Geleriyek le dillma
Çûme her şiwênî beramber xor ewestim
Her çiwar dergay geleriyeke ekemewe
Eyanxeme ser gazî pişt..
Ta zortirîn jimarey bîneranyan lê we bêne jûrê.
Pêşangayek bo xulya serdeq şkênekan
Bo jinan le dozex da.. dozexî piyaw
Bo jinan le yasa da.. yasay piyaw û yasay
Qamçî. Bo jinan le qefez da. qefezî mall û
Qefezî willat û qefezî leş!.
Pêşangayek le sallonekanî dillma
De fermûn bo danîştûn
Êweyîş hestin û le her çiwar dergay
Em geleriye tazeyewe werine jûrê!.
Ta wêney ew jinane bibînin
Ke le peçewe ta pencey pê..
Bûn be dirextî agir û

Bûn be şetawî agir û
Hestane pê!.
Ez emrro sê boynbaxim amade kirdûwe
Her yeke û rengê.. reş û zerd û spî
Her yekeyan bo mawey yek se'at ebestim
Reşekeyan le ber hemû
Jine dar'ebenûsekanî dinya
Zerdekeyan le ber hemû
Jine darlîmokanî dinya
Spîyekeşyan le ber hemû jine
Pêstbefrînekanî dinya
Her boynbaxe û bo yek se'at
Eşê reşekeyîşyan be yadî hemû
Ew jine ballindaneyîş bibestim
Ke be asmanewe kujran û
Le diwayî da bûne rejû.
Zerdekeyan be yadî jine koylekan û namokan.
Spîyekeşyan bo aştî û jine dilldar û
Jine rûnakî û gullî spîy ber baran.
Min emrro kurtîle çîrokêktan
Derbarey dû jin bo egêrrimewe:
Jinêk hebû her xawenî çiray ciwanîy leş bû.
Jinêkî dî hebû, ciwan nebû, her xawenî
Çiray eqllêkî geş geş bû.
Ke yekem kewte gellarrêzan û naw temtuman,
Temen tarîkî kird.. çirakeyşî kujayewe.
Duwemyan ewîş geyişte gellarrêzan,
Bellam çiray nekujayewe..
Duwemyan destî yekemî
Le tarîkî da egirt û
Her le ber ew çirayeyîş da..
Be yekewe
Beharî raburdûy xoyan.. exwêndewe!
Emrro her ke êware hat û
Be cile reşekanyewe geyişte kolanekan û
Serşeqam û ber dem mallan.
Îtir be xom û perdeyekî spîy sînema û

Amêr û sedan silaydewe
Eçime naw gerreke mandûwekanî şarewe.
Ew gerrekaney ke piyawekanyan
Bonî hejarîyekî şêdar û
Bonî terrepiyaz û
Bonî dûkellî cigerey qamîşyan lê dêt û
Jinekanyan bonî dillpakîyekî sakar û
Bonî sêwî bin'erd û
Pungeyan lê dêt û
Mindallekanîşyan bonî şemamey xolawî..
Eçim û le ser ew perdeye
Ew silayde rengaûrenganeyan nîşan edem
Ke mêjûy kutek û dar û
Celldey terxan bo leşî jinan egêrrinewe..
Mêjûy ew qamçiyaney
Ke piyaw le çermî cestey ewan dirustî kirdin.
Mêjûy bawkanî çeqo,
Mêjûy birayanî naw cengellî tolle.
Yeke yeke ew silaydaneyan nîşan edem:
Silaydî taybet
Be lûtebirrrawekanî jin.
Silaydî taybet be zîndanîkirdinî jin
Le kune hemamî mall da.
Silaydî taybet
Bew jinaney ke bûn be xellûz înca kujanewe.
Silaydî taybet be demdirunyan.
Be kiwêrkirdinyan be kerrkirdinyan û
Silayd û silayd û silayd
Xwên û jin û jin û xwên û
Rûbarî zirîkey dûr û dirêj!
Min emşew ew azare ekem be çirawg û
Eydeme dest jin bo raperrîn.
Min emşew ew heqe nîwexurawe,
Ew heqe zincîrkirawe,
Ra'eçllekênim ba be xwênewe
Ber dergay rîş û simêll û
Xencerî ber piştên û

Hozî nêw em cengelle bigrê.
Heştî mart: cejnêk
Ke hêşta dûkell le pijupoy hell'esê!
Cejnêk ke hêşta
Pirşingekanî ekujrê û
Cejnêk honhon gulle
Firmêsk hell'errêjê!..
Heştî mart..
Awirrdanewey billêseyek e le xollemêşî jin.

Awirrdanewey zengêk e
Lew bêdengîyey ke ebê
Be pirrawpirrî rastî biziringêtewe.
Ba le mallekanmanewe pencere
Bo ew heqe bikeynewe. Ba le sermanewe,
Le yekem hengawî
Herfe piçkolekanî qutabxanewe.
Le elifûbêwe,
Momekanî
Heştî mart dagîrsênîn û
Ber le hemûwanîş
Serî jin xoy,
Dengî jin xoy,
Zamî jin xoy,
Qetare bibestin û tirs rawnên û
Bêdengîy wek peçe bisutênin û
Serberzane
Wek awêney ber hetaw bibirîskênewe!
Min emşew direnganê..
Ke se'at ekewête weneûzidan û
Ew wextey hemûtan eniwin..
Girrî çiray serim xoştir ekem û
Bîrekemewe le wey çon sallêkî dî
Cige le heştî mart
Rojêkî tir be nêwî "rojî jinî kurde"-ewe
Bikewête nêw rojjimêrekey sallmewe û..
Lem şewewe direnganê bo ew roje

Pexşanê bikem be deşt û
Çawî jinî em willateyîş
Be çirakanî diwarroj û
Be berayî zerdexeney
Hezaran gulleberroje!

18/2 2002

Mirdin be cilkî serbazîyewe!

Mirdin xoy gorrîbû, mirdin
Be cilkî serbazîyewe, poşte û perdax
Be hemû necme û nîşane û nogekaniyewe
Be kolanêkî nexoşî paytexta ret ebû.
Mindallêk piyay da hellriwanî û her hellîriwanî û
Le pirr hawarî kird:
"Ewe mirdin e! Ewe ew piyawe bû
Ke bawkimî kuşt!"
Kes giwêy lê negirt kes
Merg ret bû!.
Hêndey nebird le kolanekey pişтewe
Qîje le mallêkî qurrîn hesta
Qîje le taqe dirextî hewşekeyan û
Zirîke le taqe pencereyan û
Hawar le derga kurte balakeyan hesta!
Lew malle da lawêkî barîk
Barîk çon dezûlekanî xem û
Barîk çon xeyallî giya û
Rengîşî kitûmit wek zerdeperr.
Pêçayanewe û le maşênêkî zîreyiyan
Axnî û birdyan.
Wityan komelle piyawê bûn
Be cilkî serbazîyewe
Wityan: Nîwey leşyan le çeqell bûwe û
Nîwekey tiryan le ademî!.
Wityan: Yekêkyan le pêşewe erroyşt
Le hemûyan reştir, le hemûyan girjtir..
Wityan: Ewe ew piyawe bû
Ke le kolanekey ew dîw
Mindalleke nasîbûyewe û

Hawarî kirdibû:
"Ewe mirdin e! Ewe ew piyawe bû
Ke bawkimî kuşt!"

15/2 2002

Mergî goranîyekî spî

Bo Fadîme Şahîndal

Lew êware spîye da, spîyekî xemgîn,
Spîyekî sard sard.. sardtir le tenyayî tarawge û,
Sardtir le cê nisêy sallanî temenî beşextebûy
Dûre willatî û.. sardtirîş le mewsîmî
Cudayî ʻaşiqan û koçî nawext û zemanî lêkdabirrîn!.
Lew êware spîye da, spîyekî xemgîn..
Le satewextî zerdeperrêkî behall nûzetiyamawî
Êwarey ew şare da, le êwareyekî lêwlerzokî
Tezîw da, tezîwtir le perrûballî zuqimgirtûy
Newrese barîkekanî kenar awî şepol le go kewtûy
Ber saye û sêberî awîlkey xornişîn..
Lew bûlêlle befrîne da
Lew êware xembare da
Ke tiwêjallê le tem û mijî kurte balay
Dirêj dirêj ekirdewe ta ew perrî awêne deştî
Uppsala û ta ew şiwêney heter eka bînîn.
Lew êware sersurrma û lew êware waqwirre da,
Ke kit û mit le jinêkî barîkeley rengperrîwî
Mil be kiwênî kostê eçû.. çon darsêwê,
Demî çûbête kilîley diwayî darrinîn û hellwerîn..
Lew êware tirsawe da
Lew şare da
Ke her le kotirêkî spîy
Zare tirîkbûy ber dem çeqoyek
Eçû wextî serbirrîn!
Lew êware spîye da
Spîyekî xemgîn xemgîn
Xemgîntir le êware kujrawekey

Sveavêgnî pêş bîst û şeş sall û
Xemgîntir le şî'rî naw qefezî menfa û
Xemgîntir le melêkî cûtkujrawî,
Bênewaz û lanewazî fesllî ewîn!
Lew êware spîye da
Le gell lêdan û ziringanewey zengî
Killêse sûrbaw û 'umir dirêjekanî Uppsala da
Le nakaw
Pelle xwênêkî dem be hallawî taze rijaw
Le ber dem malle pepûy bawkêkî şûm da
Xoy gird kirdewe û xoy lûl da û xoy hellpêça û

Înca ballekanî kirdewe û berew qubbey asmanî
Xollemêşî ew şare berew berzayîyekanî
Rohî spî û firîştey spî û xewnî spî,
Kewte şeqjin û firrîn.

"Erê ewe darhenarêkî Amed bû
Wa ballî girt?!
Yan estêrkêkî yaqutîn?!
Erê ewe gullcarrêkî gullalle bû
Le pêdeştî zamekanî hekarewe
Berz bûwe û be serman da tîj têperrî?!
Yan kaniyekey 'aşiqanî Hellebce bû
Zirîkanî û all hellgerra û kişa û kişa û
Dûr dûr firrî?!"
Bînîyan.. lew êware spîye da.. bînîyan..
Bellam pêş hemûwan.. kîjolleyekî kirasspî
Bînî:
Wa fenerêkî sûrî dagîrsaw
Le şêwey serî birrrawî mamizêk da
Be birîske birîsk û.. çirîske çirîskewe
Lerzane lerzane.. hêdî hêdî.. pizîzkhawêj,
Be dewrî serî wirrî Uppsala da kewte xulxwardin eyanbînî: Serî birrrawî mamiz,
Hell'ekişa û berz berz ebûwe ta eçûwe henawî
Spîy gewalle hewrekanewe û le wê ebû

Be mangêkî sûrî çiwardey ‘eşq û ewîn!
Eyanbînî: carêkî dî nizim nizim ebûwe
Ta ew astey xaçî tewqe serî
Killêsey kemê xwênawî ekird û
Nizim nizim ebûwe ta ew astey
Giwêy lê ebû: çon pijupoy şillejawî
Daristan û, şûşey pencerey mallan û,
Şeqamekan.. bêdeng bêdeng hemû
Wekû befir egirîn!.
Serî birrrawî mamiz.. serî birrrawî şî‘r bû,
Serî birrrawî ‘eşiq bû.. bekaw xo be dewrî
Serî Uppsala û mallan da esûrrayewe..
Jimarey kerretekanî xulxwardin, be qed jimarey
Sallanî temenî mamizî qurbanî bûn.. temenî:
Bîst û şeş dar’erxewan
Bîstu şeş momî pemeyî
Bîst û şeş gullebaxî spî
Serî birrrawî mamiz
Le asmanî Uppsala da dewranî bû
Giwêyan lê bû..
Bîst û şeş car barrjinî kird û qîjey barrjin..
Le dillî şarda û le dillî dinya da û
Ta le dillî Xwayîş da dengî dayewe.. Çawyan lê bû
Bîst û şeş car.. be naw rengekanî tirs da.. be naw merga,
Bazreqey best û.. be ser tixûbî agir da bazî eda
Çawyan lê bû.. bîst û şeş car, le kalaney çawewe,
Bîst û şeş yaqûtî bo ‘aşiqan helldaye xwarewe.
Serî birrrawî asik.. berdewam esurrayewe
Le xwarewe newresekan seryan hellbirrî û
Be befiryan wit: Temaşa ke!
Ewe serî mangeşewî Fadîme ye
Be gerdinî asmanewe!
Le xwarewe.. le ser cade û, le ber pencerey mallan da û,
Le yarîge û baxçekan da.. kîjolle biçkolekan be
Çolekekan û kerwêşke spîyekan û bûkeşûşekanî
Naw baweşyan wit: Temaşa ken
Ser hellbirrin.. Ew aske be wirşe û pirşe ye

Ewe Fadîme ye xoy gorrîwe û le gullehêro
Kirasî bo xoy kirdûwe û êsta çote asmanewe!
Kîjollekan eyan wit.. ha.. ha.. ha
A eweyan kejawey pepûlekanêtî.. le pêşewe errwa..
Ewaney lay rast.. giwarekanêtî û
Ewaney lay çep.. milwankekanî û
Ha.. ha.. ha.. ew şitaney damênîş
Kitêbekanî û kirasekanî û cd-kanî û
Reftekanî n.. be asmanewe!
Le xwarewe.. sinewberî hemû daristanekanîş
Pêkewe çawe sewzekanyan hellbirrî û be ballindekanyan wit
Ewe beharêkî kujrawî ême ye çote hewrewe.
Ewe mêrgêkî sûrî ême ye û
Wa le ber baran ebirîskêtewe.
Ewe goranîyekî narincîy ême ye û aware ye.
Ewe kiçî gomêkî ême bû çûwe asman!
Le şarîş da
Burce çawterrekey Mesîh.. qulle xemgînekey
Katidrayekey Uppsalaş le gell serhellbirrînêkî
Hêwaş da, be herdû dest xaçêkî zîwînîy
Birîndarî berz kirdewe û be
Miryem û be Svarya û be dinyay wit:
Ewe perîyekî nazdarî Xuda ye
Bûwe be gullebaxî hetaw û çûte naw asmanewe.
Ewe tavgey xedirêk e le ser zemînewe
Rûwew asman hellçûwe û hellçûwe
Ewe.. momî serî sall e.
Befir e ew wextey ekujrê.
'Eşq e ew wextey esûtê û
Zullm e wextê da'egîrsê
Ewe serî Fadîme ye
Pirçî ewe be xwêne we sema eka û
Pêy enûsê.
Xedir.. xedir.. xedir..
Lêreyîş şî'rêkî şellallî areqey şermî
Şîn û morî minîş
Serî hellbirrî û be min û be gişt bawkanî çeqoy wit:

Ewe pelle ‘arî ême ye geyiştote asman.
Ewe xencerekanî tarîkîy û wesiyetinamekanî
Xêllî xwên û carrnamey nengîy ême ye geyiştote
Asman, geyiştote qutbî jûru, geyiştote
Hemû cîhan.. Ewane qemekanî naw çingî
Ême n ebirîqênewe.. Ewe her serî mange
Şewî Fadîme nîye esûrrêtewe.. lem asmane
Misîney êreyîş da.. Ewe kepûy birrrawî kejall e û,
Memkekanî Mîştiman e û pencekanî Mehabad e û herdû
Baskî Perîxan in be asmanewe.
Ewe nerîtî qetarbestûy mêjûy ême n
Dên û deçin.. Fîşkekanî naw ‘eqllî berdistanî
Ême n ebirîskênewe..
Ey mange şewe sûre ciwanekey seru gerdinî
Fadîme berdewam xul bixo..
To Kurdistanêkî piçkoley serbirrrawî minî
Be asmanewe.. Xul bixo..
Xul bixo be dewrî xîretî ême da bo ewey
Hemîşe le bîrman bê.. le kuştarî
Hetaw û gull û jin da..
Ême çend qareman û çende kurd û
Çend mirov bûyn!
Awa mebe.. kejawey xwênawî Fadîme.. awa mebe
Ba her wa be dagîrsawî xul bixoy
Be dagîrsawî şermezarman key?
Ba le ber balla awêney xornişînta
Le ber şextey sûrî leşta
Be wirdî seyrî rîş û simêll û kellbekanman û
Mêzerekanman û înca seyrî dem û çawî nûranî û
Bêgunahman keyn!!
Awa mebe.. çiray xwênawî.. awa mebe
Ey serî birrrawî heyran..
Ey serî birrrawî keman.. awa mebe
Beşku emşew le ber tirîfey kujrawta
Le ber çil çiray narincîy
‘Eşqî pakta
Qesîdeyek bo şermezarîm binûsim

Çike çike nefretî lê biçorrêtewe..
Çike çike ‘arî lê biçorrêtewe..
Hetaku peng exwatewe û weku ximxork
Ram’ekêşê û qûtim eda..
Awa mebe û be dagîrsawî bigerrê û seyrman ke û
Piyawetîman be şewarey surî xwên û çawit bixe!
Ey mergî goranîy spî.. Ax Fadîme!
Ay ke emşew şermezarîm ser û
Çawim pê da’exa û peyta peyta be rengî ‘ar
Rengim eka!!
Minîş bawkim
Çunke le heman nejad û heman kîfî ew şimşêre m..
Çunke le heman regez û heman miştûy ew
Xencere m: ke behar û stiran û
Pepûle û xoşewîstî û azadîyan
Le to da kuşt!

Silêmanî
7/2 2002

Razêk le gell "ba"-yî tişrîn da

Ay "ba"-yî tişrîn!
"Ba"-yî sergerdan û mallwêran!
Ey destgirtû be killawî kunkunî hewr û be pirçe
Dirêjekanî baranewe! Bîgêrrewe:
Le kam derallî payizî xoşewîstî û
Le kam kawlaşî dabirranewe hatûyt?!
Be kam pile û miley rijd û xizî temawî da hellgerrayt û
Hellzinayt û, çon geyiştîte binarî xemî min?!
Çon geyiştîte lay sere awarekem?!
Lay tenyayîm?
Lay em wişe çawterranem?!
Lay em mome şipirzanem?!
Ay "ba"-yî tişrîn!
Bay posteçî nêwan min û xezanekan!
Bîgêrrewe, ba giwêrrayellî kizekanit û sersamî ber dem
Şewnamekanî xerîbît bîn. Ba agaman le tem û mijî
Kirrkewtûy ew wêstgane bêt ke lem dinya da
Berdewam meraq û eşkence hell'ehênin!. Ba
Bizanîn hewallekanî awî derbeder çî ye û ba bizanîn
Kawlaşekan diwa pepûyan nawyan çî ye û xoll çî
Enûsêtewe û berdî xwênawî kê be hanayewe çûwe û
Teyre gumrrakan êsta berew kiwê le sefer da n?!
Ey (ba)-yî tişrîn.. ebê la deyt!
La deyte lam.. lay malle qurrînekanî deverekey minîş!
Lay ew qaspe kizaney le pêxefî merg da kewtûn.
Lay rojijmêrî ew pepûlaney ke temenyan herçend çaw- Tirukanêk e, herçend henaseyek û herçend ball-
lêkdanêk e.
Min wek piyawêkî reng perrîw.. wek piyawêkî sermabirdelley
Naw kuxtî tenyayî.. bom heye ratgirim û ew pirsiyaranet

Lê bikem, ke nemwêrawe le xellkî tirî bikem. Ew
Pirsiyaraney recmyan le diwa ye û ew pirsiyaraney gumanî renga û
Reng eçênin û ziryan ewrujênin! Min bom heye
Wek jinêkî derkiraw, şarbederkiraw, ew pirsiyaranet
Lê bikem ke sertapay cesteyan be gunahe zerd û sûrekan
Razawetewe. Min bom heye. çunke hemû sallê lem
Wexte da, pirsiyarekanim ser ebirrin, weku jin seryan ebirrin.
Hemû satê lem roje da (ba)-yek eken be gijm da ke
Le agirekey cehennemewe hênawyane û şimşêrêkî birîskedarî
Be yaqût nexşawî be destewe ye. Axir min bom heye
Le gell to da bidwêm û dabinîşim. le ber ewey regî herdûkman
Be qullayî yek azar da ro çûwe. To (ba)-yî hemîşe xedir
Lê kiraw û minîş jin û piyawî hemîşe zullim lê kiraw.
Axir min rojane le qerax şarî cestema
Serî birrrawî kiçêkim edozimewe.
Axir min şewane le deşte çollekanî leşma
Mangêk, duwan, siyan,
Ke xilltanî tirîfey xoyan bûn.. ebînimewe!.
To bizane ew serane çend pirsiyar eken be killpe!
To bizane ew mangane çend pirsiyar eken be çira û
Le diwayîş da çon yeke yeke
Le ber dem tarîkî da eyanşkênin!
Min tom bo ewe nawê
Gêrranewet le me ziyatir bimjakênê!
Le me ziyatir bimgiryênê!.
Min tom ewê bo ewey ser le ber sall bigorrîn!
Em werzane niwê keynewe û reng bigorrîn
Em ballindane le werrisbûn qutar bikeyn.
Fêre firrînêkî tiryan bikeyn..
To (ba)-yekî bê deskewtî taybetî û
Le befir spîtir û tep û toz fêrî diroy nekirdûy.
Bîgêrrewe: diwa car kam xewnit bînî?!
Kam awênet daye dest rûbar û
Kam awazit bo direxte bêwejnekan xwênd?!
Ay çendim pê xoş e egeyte lam!
Min êsta tenyayî û şkistî jiyanyan pirr kirdûm le wirrêne û
Pirsiyar. Hêndey çawî jin sersam im. Hêndey leşî

Ewan pirr le kifir û tawanbar im. Min natiwanim
Bem rêgeye da bigeme lay Mewlewî û bem rêgeye da
Biçime lay dûre befrêkî Hewraman. Min cestem mîn-
Rêjkiraw e. Hemû rojê destî wişeyek yan qaçî risteyekim
Eperrê. To pêm billê! Selametî?!
Ay (ba)-yî tişrîn!
Ber le wey guzer key! Biweste û bitbînim.
Ba destê wer bidem le awî firmêskit û
Diwa pirsiyar wek agir le ‘eşiqta hellbikem!.

Silêmanî
2/1 2002

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hellebce û gerranewey darhenarekan!

Beyanît baş!.. Hellebce!.. Beyanît baş
Rojbaş! zerdexeney yekem şeqam û
Rojbaş! pêkenînî yekem pencerey kirawey mallan û
Rojbaş.. pepûlekanî kanî ‘aşiqan û ballindekanî gullan û hewrekanî ser şinirwê
Em katetan baş! jinanî taze be taze le hewrewe dem û çaw derkewtû..
Em reng û rûwetan baş!.. kiçanî taze be taze lew dîw
Hesarî tarîkîyewe bo em dîwî mêrgî rûnakî hatû
Rojtan baş..
Gencekanî taze be taze le dûkellî sedekanî nawerrast
Rexsaw û taze be taze simêll bizegirtû..
Rojbaş dar û.. rojbaş berd û
Rojbaş gullhenar û mindallekan û
Em katet baş.. hetaw!
Be xêr hatîtewe şî‘r.. Ewe bax û ewe dîwan!
Be xêr hatinewe goranî û mosîqa û namey gullgirtûy dilldaran!..
Be xêr hatîtewe ey azadî bo mallî xot!
Nemirdim û minîş hatimewe
Nemirdim û tom bînîwe carêkî dî û sewztirîş le caran!

Ew rojey le asmanewe heway jehrawîyan bo nardî, ew rojey rojhellat û roj’awa, bakûr û başûr û, çep û rast, be komell destyan naye bînit.. Min ew roje le jêr dûre asmanêkî qutbî jûru da ballindeyekî kesîre bûm, lew rojewe îtir to bûy be sêber û be xeyallî pertpertî şî‘rim. To bûy be yekêk le giwêçkîlekanî dillim. Weku henasem û temaşam le gell xom da emgêrray. Emxistîte naw fezay rengaûrengî hemû zimanekanî dinya we. Perresêlke bûy nizim nizim efirrît û minîş xoşxwanêkî heniskawî û be diwatewe û erroyiştîn. Pêkewe siwarî firroke û tirîn û siwarî keştî ebûyn û eçûyne naw tunêle dûr û dirêjekanewe, le Lenden û le gorrepanî kotirekan da pêkewe le gell ewan da kewtîne gimegim û her le gell ewanîş da pole honrawey minîş hell’efirrîn û enîştinewe û dîsanewe hell’efirrîn. Le kaftîriyakanî

Stockholm da û le hollî kitêbxanekan da û le naw baxekanî zimanî swîdî da her zû kirdimî be tablo û be gulldan û be pepûle û be rengî ‘eşiq rengim kirdî. To nawî min û min nawî to bûm yek pênase û yek pesaport û yek dem û çaw û yek hawarî pirr be dinyaman hebû.

Le Oslo û le ber tirîfey mangî ser befir û be rêgay pirteqallî da pêkewe piyaseman dekird û pêkewe dûkell bûyn û pêkewe kiwanûy beharêkî sûtaw.. Hemû carêkîş her to ber lewey şî‘rê binûsim cigere le diway cigeret bo da’egîrsanim.. Le Swîdewe bo Emrîka û her le ser yek kursî firrokeke pêkewe danîştibûyn be asmanewe wêne le diway wênetim ekêşa ta le derbendî pepûle da to bûy be derbendêkî tirî şax û daxî nêw şî‘rim û lew derbendewe îtir to çirayekit girt be destewe û derall derallî giyanim gerray.. Her pêkewe bûyn, çon birjang û pêllom. Hîç kam le hawrrêy xerîbî û tarawge ewendey min nebûn be hellmî hesretit û ewendey min nebûn be seray koçit û ewendey min qullequll le çawanit hellnequllîn.

Le Mosko û le rojanî heresêkî gewrey mêjû da, beyanîyek pêkewe geyiştîne ewê û le zerdey êware da be cûte xoman kird be hollekey lomomba da û em careyan poşakî zimanî rûsîm le ber kirdî û le nizîk rohî Poşkîn û Çîxovewe kewtînewe şeqjin û heway hollit pirr kird le nimenimey baranêkî payîze û giwêgiranit be rêjney xot terr kird!. Hegbekem pirr bû le wirde gellay cestey to. Pirr bû le namet û wênet û pirr bû le yadgarî becêmawî to!. Le şarekey Dantîş zimanî îtallît xiste giryan. Le Vînsiya toy qumrî serball şînî binarekey şinirwa têkell be pole newresî ewê bûyt û minîş le xwarewe be gîtarî wişe diwa goranîy rojî 16/3-tim ejenî. Her pêkewe bûyn.

Ewe elbûmî wênekan: Eweta lem wêneye da herdûkman desman le milî yek da ye û le roxî rûbarî Sîn da (ba)-yek le firmêsk û qijman edat û lew layîşmanewe dirextêkî şepqe be serî be şêwe le Bodlêr çû le gell gullerreş û bedekan da xerîkî raz û gile yîn, eweta lem wêneyey tirîş da min derbendî pepûlem be destewe ye û toş kirasêkî sûrî awdamanit poşîwe û westawît û gullehermêyekî kanîy ‘aşiqanit le qijit dawe! Eweta lem wêneyeş da min danîştûm û temêk be ser sermewe û toyîş le piştewe baweşit be milma kirdûwe û çenaget xistote ser serî temawîm û pepûleyekî reş be gonatewe

nîştotewe. Le bîrte?! Ew wêneye kiçe şa'îrê girtî ke nawî toy be rengêkî pîrozeyî le ser qollî kuta bû:

"Hellebce le bîrit nakeyn" her pêkewe bûyn, to çaw û min bînîn û to sîne û min henaset bûm! Min ceste û to sêber û min sêber û to cestey semayekî ezlî bûyn!.. Be dirêjayî ew hemû ra û banî sefere, be dirêjayî xem, be panî û be qullî û be baristayî koşit, to her le gellma bûyt, wefayek bûm le samall, wefayek bûm le baran, wefayek bûm le gullî mart û le qijî ciwanî mindallan!

Le Kopinhagin kirdimî be dûrgeyek le birîn û xoyşim bûm be belem û be çarogey bêaramî deryawan! Le Zîyurîx be rengêkî narincî xemgîn rengim kirdît û şarêk bûyt û keçî bûbûyt be hemû nîştiman!

Le Ellemanya û lay Goteyîş giryanî ew kurde awaranem bo kirdît be wirde estêrey gerdinit ke le dûrewe her hemûyan ballagerdinî xaçeket ebûn.

Her le gellta bûm.. Le xollemêşta gull bûm û riwamewe.
Wa hatimewe lat û
Nizîk nizîkî çawekanit.
To şarî şî'rî.. şarî ciwanît, şarî xunçe.
Nek şarî şimşêr û qeme.
To şarî Goran û rûnakît,
Rîşî pirr le pepûley Mewlewît
Hatimewe lat
Nizîk nizîkî henasekanit.
Hatimewe lat û etbînim pirrît le kanî taze teqîw
Pelkî hellalleyit û rengit sûr eçêtewe.
Ebînim! Enberxatûnit zîndû botewe
Le carî caran genctir û şengtir û Mewlewîş gerrawetewe û
Kakollî spî reşreş botewe!
Hatînewe lat
Çirawgekanman le sîley kolane teng û tarîkekanta hellkirdûwe
Nexmey bend û cirîwe û cûkey gîrawî naw

Qefezekanman birdewe asman!
Goranî û mosîqay zîndanîman rizgar kird.
Dergay bizmarrêjî daxirawman le ser pêkenîn kirdewe.
Werdiyanî pasewan be ser ’eşq û be ser
Rengî cilûbergewe, pasewan be ser dem û lêwmanewe,
Be ser rengî qijmanewe, be ser namekanmanewe,
Be ser demûçawmanewe, be ser bûk û be ser zawa û
Be ser dergay hewşeman û be ser cûlley dest û pencemanewe.. Pasewanî tarîkîman le naw rûnakî da tiwanewe!

Le siya sallekanî to da, ewane çiyan bo kirdî?!.. ‘Erdî janekantiyan ser le niwê hellkendewe. Ne pencereyekyan le ser gullesîsekanî derûnit kirdewe
Ne dirextêkî bêwejniyan dillxoş kird û
Ne çawî karêzêkyan rûn kirdewe û
Ne kollanêkî nutekî cestey toyan roşin kirdewe û
Ne awirrêkyan le şeqamî şeqarşeqarit dayewe û
Ne gillopêkî tazeyan le jûr serî kitêbxaneyek da hellkird û
Ne polêkyan bo herfe biçkolekanman kirdewe û
Ewan gulleyan eçand û.. têzabyan egirtewe..
Hatînewe lat
Bellam min daway.. tûrrebûnit lê ekem
Le êste be diwawe mehêlle û mehêlle dabinîşîn û sirewit bideyn
Eger be tenha her hîkayetî raburduman bo kirdî û
Sibeynêman xiste perawêzewe.. Eger le batî nan her diruşman derxwardayit û her be tenha rojnameman bo xwêndîtewe.. Tûrre be, mehêlle, dermanke, memangire xo, eger bînît êmeyîş herweku ’aşiqe dirozinekanit, zimanî lûsit bo exeyne kar.. Dermanke, memangirexo, eger êmeyîş her le rûbare lîxnekan û le qelebaçke fêllbazekan û le siyasîye lengekan û le şaîre muzewerekan bûyn!
Dermanke, tûrre be û hellbike û tûrrman de
Eger êmeyîş wecaxêkî kiwêr û darêkî zirr û şerrêkî dîke bûyn bo tilanewet!

Hatmewe lat..
Bellam ber le wey ser bikem be henawta.. Her le ber dergatewe
Zayelleyek lay dam û le gell xoy da birdimî be deştî giryanêk da birdimî..
Bo awayî xêllî Heme
Lewê îtir:
Fûyekim kird le xollekey xêllî Heme û
Tozêkî sûr le dîwanî Nalî hesta
Pirîşkêkim ber azarî ewê kewt û
Jan teniyewe û pêdeşt girtî û şax hellgîrsa
Min her mişt̂ek xollemêşî ewêm hellgirt
Kirdim be ser şinirwê da û dund dagîrsa
Min qemselley şehîdêkim le ber kird û
Îtir herçî dar û berd e all hellgerra
Ewan milî sîûpênc momyan birriymewe û
Bellam ême hêşta şew bû xorman hêna
Le wêwe, le awayî xêllî Hemey xilltanî xedirewe,
Le derûne xalliyekey Nalîyewe ke wek ney enallî û
Wek naxî Welîş qirçeqirç esûta, le wêwe le
Serçawey teqîwî be lûzey leşmanewe xwênîş
Bazireqey best, xwênêk be xurrem hat û bû be sêlaw û
Ballay werzêkî kellegetmanî dapoşî.
Qîjeyek le wişe hesta
Qirîşkeyek le xakewe berz bûwe, hewrî rewend û şillejawî giryan û baranêkî reşreş reştir le xedrî Kerbela û
Reştir le dûkellêkî enfal û reştir le tawanbarî..
Xedir.. le şêwey tewrêkî rîşin da
Xedir.. le şêwey nîfaqêkî demamikdar da
Tarîkî berew awayî rûnakî.. dizey kird
Tarîkî şimşêrêkî efxanî hellkêşabû
Xedir û şewezeng pêkewe hatin.
Tarîkî berew awayî rûnakî dizey kird

Direxte kan neyan enasîn, girdollkekan neyan enasîn,
Gijûgiya û taşeberd û binçkekan rûyan lê wer'egêrran!
Namo bûn be xak û xoll..
Xerîb bûn be gull û mindall û ballinde û
Xerîb bûn be xoşewîstî û.. rewe riqê bûn
Bê reg û bê asman û bê nîştiman!
Be nawî Xudawe hatibûn.. be nawî kitêbî Xudawe
Bellam her le ber çawî Xuda û.. le ber demî Xuda û le mîhrabî Xuda da
Kitêbî ewîn û wişey firîşteyî û
Suretî bêgunahî mindallanyan ser birrî!
Le xeflleta polêk le çira û
Polêk le perwane û polêk le sirûdyan kuşt
Le xeflleta çûne ser rûnakî..
Wextêkîş rûnakî şellallî xedir bû
Le gellya xak û le gellya deşt û le gellya heq raperrî!
Le awayî xêllî rûnakî
Ew şewey tarîkî dizey kird
Jinêk, jinêkî le gullegenim ciwantir û, le awî piluskêkî
Hewarman bêgerdtir û, le tewar beçingtir û le sirûdî meşxellanîş gerimtir
Hawarî kird û pirsî:
Ey xêllî tarîkî:
Ew demey bahozekey enfal hellîkirdibû.. ew
Demey jine direxte û gullî mindall û perrey Qur'an û
Hawarekanî mallî xudayî ra'emallî..
Dest û şimşêrî êwe.. le kiwê bû.. Nawnîşantan le kiwê bû?!
Cîhadtan kam betanî ordugay eda be xoy da û
Le ber kam awêne da ra'ewestan û
Serî kam kifirtan ebirrî?!
Ke Hewraman siya çemaney ekujra û melekanî bê ball û
Nan egirya û aw ekirruzayewe û berrû bê killaw û
Merg ebarî

Dest û şimşêrtan le kiwê bû..
Eypirsî.. ew jine eypirsî
Ne darman ne berdman ne dirext û ne ajell û ne pîrekanman ne mindallman.. êwe nanasin
Ey xêllî tarîkî êwe le kiwê we hatûn?..
Ew şewe tiwayewe hellbestim û
Tiwayewe xeyallim
Dûkell bûm erroyiştim û zellmîşim le gell da
Ew şewe zirîkey 'eneb bûm, egeyiştime
Lay Xuda û mangêkî kujrawim le gell da..
Ew jine hawarî gella bû ewerî
Ew jine eypirsî û eypirsî:
Êwe kê n?!
Kurrî kam tarîkî n?
Wa desttan be xwênî xoretaw sûr bûwe?!
Êwe kê n? Kurrî kam dozex in..
Kurrî kam cengell û ehrîme n?!
Ew şewe tarîkîm xwardewe..
Bo mergî momekan azarê colaney giyanim bû
Bê wiçan rayjenîm..
Ew şewe firyadim negeyişte hetawim û
Mirdim û nemirdim..
Ta diwa car le zamma roj bûwe û
Le janma xor hellhat..
Ew jine çûwe ser minarey qurbanî..
Minarey sî gerdin.. le wêwe qîjanî:
Ko binewe kurranî rûnakî
Kurranî sirûdî meşxellan
Ko binewe bo ewey ke xewî sibeynê
Mindallan
Nesutê û bo ewey kiwêr nebê çiraxan!
Eyqîjan:

Werinewe.. Bêne naw birînî Şarezûr
Werinewe.. Aw tînûy êwe ye wek Nalî û
Wek badî xoş mirur
Bazêkîş witî:
Dizêwtirîn rengî jiyan rengî şerr e
Ême xoman lew be dûr dûr dûr egirîn.
Naxoştirîn dengî jiyan dengî çek e
Ême penceman lew be dûr dûr dûr egirîn.
Tengtirîn şiwênî jiyanîş naw senger e
Ême xoman le çûne naw ewîş dîsan be dûr dûr dûr egirîn!
Bellam ew katey xedir xedir le pişteve ambazman bê
Pall pall pallman pêwe binê.. ewsa îtir ew renge ekeyn be tofan
Ew denge ekeyn be lerzey bûmelerze û
Ew sengereyîş ekeyn be şiwênî xoretaw.
Ey cundekanî tarîkî!
Her le payîzî xedrêkî bozeqney rîşin da bû.. dizetan kird
Hatine jûrê û rîzê zine û rîzê coge û
Rîzê dêrawtan ser birrîn.. Bo ye xak û xoll raperrî.
Polê gull'estêre û polê beste û
Polê goranîtan kuştîn.. Bo ye hemû çirakanman
Bo ye hemû pencekanman ko bûnewe û.. dest raperrî.
Êwe polê le tewarî bêwejintan bo cê hêştîn
Bo ye îtir herçî helloy sûrî tolleman e
Gird bûnewe û hellfirrîn û kêw raperrî..
Ey awayiyekey rûnakîy xêllî Heme.. dayikî Nalî
Lew temewe ke serpoşte û her le rengî em kostet e..,
Bo pêkenînî şinriwê û bo gerranewey şehîdan bo
Hellebce ser hellbirre û
Îtir megirî!

30/10 2001

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com